welat

Sal:3 Hejmar:115 1–21 Gulan 1994 10.000TL (KDVD) Rojnameya Hefteyî

## Koma Çiya: 'Cehşên çanda Kurdî jî hene'



Rûpel 16

# Hêviya dewletê: Çapemeniya derewîn

Li Kurdistanê şerê çekdarî her diçe dijwartir dibe. Dewletê heta niha tu rê nemane ku neceribandiye ji bo vemirandina têkoşîna gelê Kurd. Niha di nav vê bêhêvîbûnê de, dewlet careke din hêviya xwe bi çapemeniya burjûwaziyê ve girê dide. Di destpêka 94'an de bi trilyonan Tl li çapemeniya Tirk hate belavkirin da ku beşdariya xwe ya ji bo şerê psîkolojîk zêde bikin.

Di van hefteyên dawî de çapemeniya Tirk ji her dem bêhtir sedeqeta xwe ji bo dewletê nîşan dide û li gor daxwaza generalên Artêşa Tirk nûçeyan amade dike û dixwaze raya giştî bi agahiyên çewt bixapîne. Em bala gelê Kurd ji nû ve dikişînin ser vê durûtî û nerastiya rojname û televizyonên Tirk ku bi senaryo û nûçeyên wan ên derew neyên xapandin.

Rûpel 8




## Nivîsara Welat

### Li benda me bin

Piştî hejmara 114. du hefte li pey hev Welat derneket. Ji mecbûrî me du hefte derketina wê rawestand. Ji bo çareserkirina pirsgirêkan pêdiviya me bi çend hefteyên din jî heye. Ji xwe em vê hejmarê jî bi mebesta ku em xwendevanên xwe ji sebebên derneketina Welat haydar bikin, derdixin.

Pêşî divê em vê bibêjin: Welat wê weşana xwe bidomîne. Pirsgirêkên Welat hene. Niha em di nav hewldana çareserkirina wan de ne. Piştî vê hejmarê wê derneketina Welat demeke din jî bidome. Heta ji destê me were emê vê demajoyê kurt bikin. Pirsgirêka Welat a bingehîn ya belavkirinê ye. Berê Welat bi navgîna BBD'ê dihate belavkirin. Paşî ji ber hin sebeban me bi xwe bi îmkanên xwe Welat belav kirin. Bi qasî sê–çar mehan me bi destan û bi kargoyê, belavkirina Welat ceriband. Bes mixabin, di belavkirinê de em bi ser neketin û dawî me dît ku Welat bi vê cure belavbûnê, tenê digihe destê %10 xwendevanên xwe.

**Mazhar Günbat**

Rûpel 2



## SERHILDANA RAMANAN

Divê em baş zanibin ku dayîka problem û êşên me, bêwelatiya me ye, ji ber ku zanistî di bin kumê dewletê de xurt dibe, bi rêk û pêk tê meşandin û zanyar pir dibin. Bi van jî jiyan bi rûmet û şîrîn dibe, feqîr kêm dibin, nezan namînin, hezkirin çêdibe û kar dibe sembola rûmeta mirov.

**Dr. Memo Xarkov**

Rûpel 13

# Perê xwe di bankayên Tirkan de nehêlin

Gelê Kurdistanê; neçar e, belengaz e, piranî bi xwedîkirina sewalan, bi paletî û şivaniyê jiyana xwe danekî têr, danekî birçî, bi zor û çetinî dibihurîne. Astengî tenê ne aborî ye. Kuştin, qirkirin, girtin, koçberkirin, kambaxkirina mal û gundan jî bûye ka.ê rojane.

Bi kurtay, bi hebûn û tunebûna artêşan ve hatiye girêdan. Hebûna gelê Kurdistanê bi serkeftina artêşa wî (ARGK) ve ye. Tunebûna artêşa wî jî kiriye ku artêşa kedxwaran ji xwe re bike armanc.

Herdu artêş jî li dijî hev di şerekî germ de ne. Artêşa gelê Kurdistanê ji bo mafê demokratîk û neteweyî; artêşa kedxwarên Tirk jî, ji bo domandina jiyana kedxwar û parastina sazûmana mêtinger e. Di vir de heqîtiya şer (şerê bi heq) tenê ne bes e, liv û têkoşîn pêwist e. Gelê Kurdistan di qada aborî de bi wî halê xwe yê neçar bi deh hezaran gerîla xwedî dike, li dijî kedxwarên Tirk têkoşînê didomîne û dide jiyandin.

Komara Tirkiyê li dijî têkoşîna rizgariya neteweya Kurdistanê bi giranî ji aliyê aborî ve tune bûye. Enflasyon, deyndarî, buhabûn, gihîştiye qirikê. Ger pakêta "aborî" bi cih neynin û Çiller ji parsê destevala vegere, ewê di demeke kurt de bifetise. Ger bi cih bînin jî nikarin aboriyê xelas û rizgar bikin.

Karker û dewlemendên Kurdistanê, demokrat û aştîxwazên Tirk û neteweyên din, bi nemaze yên ku li derveyê Tirkiyeyê dijîn perên xwe ji bankayên Tirkan bikşînin. Bankayê Tirkan ber bi tunebûnê ve diçin. Di van rojan de pir kesan xwest ku perê xwe bikşînin, bankayan pereyên wan nedan. Ji wan, çend kesan jî nas dikim.

Kesên ku pereyên wan di bankayên Tirkan de ne, bêbacê ji faîzê %1.25 diçe artêşa Tirk, yanê diçe ji kontra re diçe ji cerdevanan re; yên ku gelê Kurd dikujin dide jiyandin.

Keda xwe neherimînin, keda xwe ji mêtingeran re pêşkêş nekin, perê xwe bikşînin, dost û nasên xwe agahdar bikin.

**Ahmet BARAÇKILIÇ**

# Xebatkarên Rojnameya Welat merheba

Ez silavê şoreşgerî ji we re bi rê dikim û serxwebûna we daxwaza min e.

Min divê bi çend peyvan bersiva peyvîna Tansû Çiller'ê ku di şeva 26'ê Avrêlê di TV'ê de kiribû, bidim.

Stî Tansuyê bi rûyekî qermiçî, bi dilekî nexweş wiha digot: "Gelî bav û dayikan, hay ji zarokên xwe hebin. Vê havînê wê wan bixapînin, ji bo ku bibin serê çiyan. Bes e, êdî bila ciwanên me hew bêne kuştin." Lê dema devê wê wisa digot, rûyê wê dida zanîn ku ew viran dike.

Ez jî ji Tansuyê re dibêjim dema xapandinê ji zû ve derbas bûye. Tansuya xwelîliserî, guhê xwe baş bide min, sala çûyî weke îro min bi xwe kurê xwe şand leşkeriya gelê wî.

Yazdeh zarokên min hene, ezê heb û heb bişînim. Ez dibêjim heval Ceng demsala te pîroz be-pîroz be, ji te û hevalên te re serkeftin û serkeftin...

Stî Tansu! Dayik û bavên Kurdên ku dilê wan bişewite û bi ya te bikin nemane. Haya te ji te tune, dayik û bavên wan jî karê xwe dikin ku herin, bigihêjin zarokên xwe. Erê Stî Tansu, dema hûn zarokên xwe rê dikin leşkeriyê, bi def û zirneyê hûn dîlanê dikin, çima em jî zarokên, xwe bi def û dîlan nekin riya artêşa gelê wan? Ma gelo artêşa me jî ya te bar bi bar ne bi şereftir e?

Car din ez dibêjim heval Ceng demsala te pîroz be, serkeftin û serkeftin.

**Xalê ALO**

# Welat wek dûrbîneke ye li ber çavên me

Hevalên hêja; kesê ku dûr be ji welatê xwe, ji deng û basê welat jî bi dûr e. Li welatê xelkê mirov wek kora ye û ji ber vê yekê, mirov her û her dixwaze ji welatê xwe hinek tiştan bibihîse.

Ez xwendevanekî (xwendekar) Kurd li welatê Ukrayinê li bajarê Zeporajê me. Hêvîdar im, spasdar im ku ez rojnameya Welat ji destê we bigirim. Ji bo ku rojnameya Welat wek dûrbînekê ye li ber çavên me, em dikarin bi (navgîna) wê li welatê xwe binêrin.

**CIWAN**

## Em bi dil û can bi Welat re ne

Welat welatê min, canê cana
Tu bûyî ronî, şewqa te xwe vedide
Tu bûyî firatê mezin, Kurdistanê av dide
Zimanê te yî xweş keyifê bi me dide
Bi te serbilind in, ku li cîhanê deng dide

Xebatkarên rojnameya Welat, em xwendevanên di Yekîtiya Xwendevanên Welatparêzên Kurdistan (YXWK) de, li Sovyeta berê, gelek silavên xwe, ji dilekî germ, ji we re dişînin.

Bi can û dil, Newroza sala 1994'an, li we û hemû gelê Kurdistanê pîroz dikin. Hêvîdar in ku wê ev Newroz ya serkeftin û azadiyê be, hêvîdar in ku hûnê rêkirina hejmarên Welat berdewam bikin

***Yekîtiya Xwendevanên Welatparêzên Kurdistan / Xarkov***

# Nivîsara Welat

## Li benda me bin

Dema rojnameyek baş belav nebe, ji her aliyî ve qels dibe û nagihe armanca xwe. Di van sê-çar mehên dawî de, me dît ku Welat roj bi roj ji rola xwe dûr dikeve, pêwendiyên wê ji xwendevanên wê qut dibin, di ber pirsgirêka belavkirinê de gelek pirsgirêkên din jî xwe nîşan didin.

Dawî em mecbûr man ku ji bo demeke kin weşana Welat bisekinînin da ku em pirsgirêkên wê ji binî ve çareser bikin û Welateke nûtir û xweşiktir bigihînin destê xwendevanan.

Bi çi awayî dibe bila bibe, emê yekcar biserkevin. Tu şik û gumana me ji vê yekê tune. Serkeftina rojnameya Welat karekî pêwist û zarûrî ye. Ji ber ku ew dengê gelê Kurd e û rojnameyeke neteweyî ye. Wê Welat biserkeve lê zûbûn an jî derengbûna vê serkeftinê bi xebatê me û eleqeya xwendevanên me ve girêdayî ye. Bi taybetî eleqeya rewşenbîrên Kurd ya ji bo zimanê wan di vê hêlê de dikare gelek tiştan biguherîne. Ango, ger rewşenbîrên Kurd pariyekî serê xwe bi zimanê xwe re biêşînin, hilkişandina hejmara xwendevanan ji 3-4 hezaran ber bi 15-20 hezaran ne xeyalek e.

***Niha bêrawestin em hewl didin ku pirsgirêkên Welat çareser bikin û astengên muhtemel jî pêşiyê rabikin. Pêwist e em li vir behsa guherîneke muhtemel bikin. Ew jî guhertina navê Welat e. Ger em mecbûr bimînin, (ji ber hin tevlîheviyên fermî û hiqûqî) dibe ku em Welat bi navekî din derînin. Lê hê jî ev nav nekifş e û ji xwe îhtîmaleke pir zeîf e, lê dîsa jî me pêwist dît vê rewşê bidin zanîn. Ger navê Welat biguhere jî, wê ji aboneyên wê re rojnameya nû bê şandin.***

Mixabin îro zimanê Kurdî qet bala rewşenbîrên kurd nakişîne û ji sedî yek jî meraqa wan tune ji zimanê wan re. Lê emê bi ser wan ve herin. Bi çi awayî be, emê wan mecbûr bihêlin ku bi zimanê xwe bixwînin û binivîsînin.

Niha bêrawestin em hewl didin ku pirsgirêkên Welat çareser bikin û astengên muhtemel jî pêşiyê rabikin.

Pêwist e em li vir behsa guherîneke muhtemel bikin. Ew jî guhertina navê Welat e. Ger em mecbûr bimînin, (ji ber hin tevlîheviyên fermî û hiqûqî) dibe ku em Welat bi navekî din derînin. Lê hê jî ev nav nekifş e û ji xwe îhtîmaleke pir zeîf e, lê dîsa jî me pêwist dît vê rewşê bidin zanîn. Ger navê Welat biguhere jî, wê ji aboneyên wê re rojnameya nû bê şandin.

Guhertina navê Welat bi me tiştekî ne xweş e. Ji ber ku Welat bi navê xwe gelek deng daye û xwe bi wî navî wek rojnameyeke neteweyî xwe daye qebûlkirin. Ji ber vê yekê heta ji destê me were em navê wê naguherînin. Lê ku em mecbûr man emê bi navekî din dîsa riya xwe bidomînin.

Emê çend hefteyên din jî, ji hev dûr bin. Lê hûn dev ji me berdin jî, em dev ji we bernadin

Bi hêviya di demeke nêzîktirîn de em careke din hev hembêz bikin, vî qasî bi xatirê we.

**Mazhar Günbat**


# Rûpelek ji mihrîcana vekirina Enstîtuya Kurdî

Berbanga 22'ê Avrêlê (Nîsanê) berbangeke bi hêvî bû. Di wê rojê de li Berlînê tîrêjên şefaqê hinek tişt digotin: "Hûn bi xêr hatin! Em mêvandar in hûn mêvan in!.." Dema ku mirov li bejna rojê dimeyzand, bawer bikin ji bûkekê jî ciwantir, xwe dikenand û nîşan dida. Vê rastiyê ne tenê ji min re ji her kesekî re xwe pêşkêş dikir.

Ji serê beyanê ve gel dikişiya û dihat. Di serê her kesî de pirseke wisa hebû; wê Enstîtuya Kurdî, çawa vebe? Gelo, wê mêvan kî bin, tenê emê bi xwe bin, lê wê di nava me de dostên me jî hebin?

Dema ku tu xwe digihînî kolana Zossenerstr hema yekser numereya 41 tê pêşiya te. Tu derbasî hundir dibî. Berî tu xwe bigihînî navenda Enstîtuyê, balonên rengîn ên kesk, sor û zer li ber bayê şahiya bêsînor direqisin û têne pêşiya te, bi hev re xwe li rûyê te diqelibînin û dibêjin: "Tu bi xêr hatî, fermo!" Li aliyekî bêhna gulavê, li aliyekî keçên Kurd ên bi kincên neteweyî, li aliyekî dengê muzîka Kawûs Axa û Birayên delal em herin Kurdino... li aliyê din jî navsaliyekî Kurd avê direşîne û di ber xwe de strana "Apê Mûsa" dibêje...

*Birêz Şerîf Wanlî li ser navê YRWK (Yekîtiya Rewşenbîrên Welatparêzên Kurdistanê) axaftinek pêşkêş kir. Di axaftina xwe de bi firehî li ser dîroka gelê Kurd û Kurdistanê sekinî. Sedema avakirina enstîtuyê bi firehî anî ziman. Daxuyand ku delametên enstîtuyê gelekî mezin in, bi taybetî di vê demê de ku dijmin bi hemû şêweyan êrîşên qirkirinê dihêne ser kelepora gelê Kurd.*



Meydana li pêşiya enstîtuyê hatibû dagirtin. Di nava gelê beşdar de, ku hatibû enstîtuya xwe pîroz bike, ji heft salî heya heftê saliyan hebûn. Ji gelek deverên dûr hatibûn. Hinek ji Rûsya, hinek ji Kurdistanê, hinek ji Tirkiyeyê, hinek ji Swêdê, Hollanda, Danmarka û hinek jî, ji gelek bajarên Almanya yên cur be cur. Berlînê, di wê rojê de ji dused mêvanan bêhtir hembêz kir. Kurdên li Berlînê bi şahî ber bi mêvanan ve diçûn û bixêrhatina wan dikirin.

Jinan dest bi zilxitan kirin, sloganên weke "Bijî Kurdistan, Bijî Serxwebûn!" bilind bûn...

Di dilê min de keleke germ hebû. Di damaran de xwîna min weke her rojê nedigeriya, weke ku ez di nava tayeke sar de bim, canê min li ber wê heyecana gel dilerizî.

Ez ber bi sehneya axaftinê ve çûm. Min li ger nihêrî. Li pêşiya min zana, rewşenbîr, dîrokzan, mamoste û welatparêzên Kurd hebûn. Germaya wan ronakbîrên Kurd û yên biyanî ku li benda vekirinê bûn, nedihişt ku ez ji wê girêdanê rizgar bibim û bixêrhatina wan bikim.

Di rêza yekemîn de mêvan hebûn. Di nava mêvanan de Prof. Dr. Hesretyan, Prof. Dr. Kinyazê Ibrahîm, ji Moskov û Kazakîstanê hatibûn. Wekî din Prof. Dr. Martin Benhold, Yaşar Kaya, A. Durre, F. Huseyn, Prof. Dr. Î. Şerîf Wanlî, gelek zanyarên Kurd, Tirk, Alman û yên din hebûn.

Min dest bi axaftina xwe kir:

"Mêvanên hêja...

Di vê rojê de em gelê Kurd, ji bo parastin û pêşxistina edebiyat, ziman, kultur, çand û hunera xwe yên neteweyî yên ku bi hovîtî hatine talankirin, em hemû bi hev re, bi dilekî geş, bi kêfxweşî û bi bîr û baweriyeke mezin, em li biyaniyê, li welatekî ji Kurdistanê gelekî dûr enstîtuya xwe, Enstîtuya Kurdî ji bo zanist û lêkolînê ava dikin.

Wateya vê rojê gelekî mezin e. Di vê rojê de, di sala 1898'an de gelê Kurd cara yekemîn li hemberî zilm û zora Osmaniyan, li hemberî dagirkerên Kurdistanê, bi navê "Kurdistan" li Qahîreyê– Misirê rojnameyek deranîn. Dîsa di vê rojê de ji bo Kurdistan her demê zindî û nemir bimîne Enstîtuya Kurdî ava dibe.

Ji dûr, ji nêzîk, ne tenê Kurd, di nava me de birayên Ermenî, Aşûrî, Ereb, Alman, ji Rûsya, Kazakîstanê, Rojhilata Navîn, Îskandînavya, Hollanda û ji gelek bajarên Almanya û dewletên Ewrûpî yên din, ji her çar parçeyên Kurdistanê, mêvanên me hatine. Em jî dil destên we hemûyan diguvêşin û bi dengekî bilind dibêjin: Hûn bi xêr hatin.

Mirov bixêrhatina mêvanên biyanî dike. Bawer bikin, em we biyanî nabînin. Lewre ev cih cihê we ye. Mala we ye. Hûn hemû xwediyên vê malê ne. Ev ne tenê mala gelê Kurd e, ev mal mala her kesekî pêşverû, demokrat, rewşenbîr û mirovperwer e.

Me ev mal ji we re ava kiriye. Madem wisa ye, ez vê dikarim bibêjim; ev mal li me tevan pîroz be, em hemû bi xêr hatine mala xwe..."

Birêz Şerîf Wanlî li ser navê YRWK (Yekîtiya Rewşenbîrên Welatparêzên Kurdistanê) axaftinek pêşkêş kir. Di axaftina xwe de bi firehî li ser dîroka gelê Kurd û Kurdistanê sekinî. Sedema avakirina enstîtuyê bi firehî anî ziman. Daxuyand ku delametên enstîtuyê gelekî mezin in, bi taybetî di vê demê de ku dijmin bi hemû şêweyan êrîşên qirkirinê dihêne ser kelepora gelê Kurd.

Di axaftina xwe di birêz Wanlî, bang ji hemû enstîtuyan re şand, ji bo yekîtî û avakirina Akademiyeke Kurdî ji bo zanist û lêkolînan.

Serokê Partiya Karkeran birêz Abdullah Öcalan, mesaja xwe gihande platformê. Serokê rêzdar pîrozbahiyeke germ dişîne û dibêje: "Hûn bi rêberiya YRWK'ê xwe digihînin avakirina saziyeke wiha bilind. Saziyên wiha gerek e ji niha ve werin avakirin, êdî gerek e em saziyên xwe yên neteweyî ji serxwebûnê re bi hemû hêza xwe ava bikin. Bêguman gelê me ji hemû gelên din bêhtir muhtacî lêkolîn û lêgerînan e, divê em hunera xwe bi hemû şêweyan bidin pêş. Enstîtuya Kurdî jî, wezîfeya wê ya herî mezin jî pêşxistina wan nirxan e... Di nava têkoşîna me de ciwanên qehreman xwe feda kirin, ji bo pêşerojeke azad. Hûn ji bo çand û hunereke azad xebata xwe bi rê ve dibin... ez Enstîtuya Kurdî ji bo lêkolîn û zanistiyê li we û li tevayî gelê Kurd pîroz dikim..."

Ji Kurdistanê, ji Unîversîteya Selahedddîn mesajek hatibû, ji Rojhilat... hema hema ji Amerîka heya Kurdistanê, ji Avûsturalya, ji hemû aliyên dinyayê mesaj hatin. Di wê kêliyê de, apê nemir, Apê Mûsa hate bîra min. Di nava me de tenê Apê Mûsa tunebû. Lewma jî, ji mihrîcana me ji şarezayên Kurd ên mezin, Apê Mûsa kêm bû.

Roja din, em berê xwe didine Hombultê. Ew roj roja semînerên zanistî ye. Gelek zanayên Kurd û yên biyanî, semînerên xwe pêşkêş dikin û ew semînerên pêşkêş dibin, yekser werdigerin, sê zimanan.

Roja sêyemîn, roja Şahiya Enstîtuya Kurdî ye. Hunerkom, tev di vê şevê de beşdar dibe. Li aliyekî şanoya Tawan û Tole, li aliyê din jî Koma Botan, şev geş dibe.

Niha her kes li benda vê ye; gelo, emê kengî berhemên enstîtuyê bibînin? Li dawiyê, vê saziya neteweyî; li hemû mirovahiyê pîroz dikim.

**DILBIXWÎN**

## BANGA ENSTÎTUYA KURDÎ

Gelî eleqedarên zimanê Kurdî!
Em wek Enstîtuya Kurdî, di nav hewldana birêkûpêkkirin û pêşvebirina her cure hêjahî û berhemên gelê Kurd de ne. Niha ji bo me amadekirina ferhengeke Kurdî wek karê herî acîl xwe dide xuyakirin. Xebatên me yên ji bo ferhengê, ev demek e dest pê kirine û didomin. Bes çavkaniyên di destê me de, ne bes in. Pêdiviya me bi çavkaniyên din heye. Ji ber vê yekê, em ji hemû kesên eleqedar hêvî dikin ku xebatên xwe yên li ser ferhengê –biçûk an jî mezin– ji me re birêkin da ku em di vî karî de, di demeke kin de serfiraz bibin.

***Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê***

**Navnîşan:**
Tarlabaşı Bulvarı 128.
Beyoğlu/İstanbul

## Başûr: Carekîtir îş birakujî

**Navenda Nûçeyan–** Rojî 1 Gulan şer le nêwan dû eşîretî başûrî Kurdistan da derkewt le ser kêşey zewî û zar, her yek lem eşîretane ser be herdû parte serekiyekey Başûr YNK û PDK. Agirî şer her le nêwan em dû eşîrete da perey nesend, belkû be xêrayî nawçe û şarekanî tirî Başûrî girtewe, be corêk ke bo çendîn roj bizafî bazirganî, hat û çoy xelkî le kar kewtin. Em careş be hoy nakokî xêlekî û dûberekî naduristewe le deyan mirovî bêtawan hatine kuştin û ziyanêkî zor le xelkî medenî kewit. Sereta be nawbijî PKK bo çend rojêk şereke westa, paşan gerimtir û le herdû herêmî Soran û Badînan û le şare gewrekan îş destî pê kirdewe. Em careşyan her zerer û ziyan beşî xelkî bêtawan bû, be corêk ke kiloyek şekir le 30 dînarewe geyşte 100 dînar û barî abûrî xelkî berew xiraptir bird.

Le encamî em şerane da hêzekan dewletî Iraq le ser sinûrî Kurdistanî Fîdiral kewtunete cimûcul û xo kokirdinewe, le layekî tirewe hêzekanî Bizûtnewey Islamîş be harîkarî hêze serbaziyekanî Iran hêrişî deverî Helebce yan kirdiwe û pencey tawanî dewletî Rom îş şitêkî aşkiraye be rûdawekewe.

Dête zanîn ke gelî Kurd le başûrî Kurdistan be hemû çîn û twêjekaniyewe şer naxwazê û dijî şerî birakujiye le her şwênêk bêt û be her biyanûyekewe bêt, le destpêkî şereke we le hemû nawçe û şare gewrekan da be raşikawî dijî şereke derkewtûne... Tenha le şarî Hewlêr 34 hezar imza dijî şer kokirawnetewe, le çendîn şar îş xopîşandanî mezin saz kirawe, yek lew xopîşandanane le şaroçkey "Diyana"y ser be Hewlêr bû ke le encam da le layen hêzekanî PDK teqe le xopêşanderan kirawe û çendîn kesyan lê birîndar kirawe.

Diwatir be hoy sercem part û rêkxistine Kurdiyekan ewe twanra sinûrêk bo şereke dabinrê û şereke biwestênrêt û kobunewey gewrey le ser saz bikrêt, ke ta êstaş le şaroçkey Selahedîn dewam dekat, ke le nawyan da nwênerî PKK û PDK–Îran îş heye.

# Li Îspanyayê buroya ERNK'ê vebû



*Di gel şerê gerîla yê ku li Kurdistanê gur dibe, li Ewrûpayê jî livbaziyên Kurdan û çalakiyên dîplomatîk zêde dibin. Piştî buroya ERNK'ê Îtalya û Yûnanîstanê li Îspanyayê jî buroya ERNK'ê vebû.*

**Navenda Nûçeyan–** Buroya ERNK'ê ya Informasyonê di 27'ê Avrêlê de li paytexta Îspanyayê Madrîdê hate vekirin. Di vekirina buroyê de ji Partiya Karker ya Sosyalîst Anna Balletbo, Mebûsê Partiya Çepa Yekbûyî Manuel Garcia Fonseca, Sekreterê Giştî yê Komeleya Mafên Mirovan ya Îspanyayê Luis Miguel, Serokê Tevgera Aştî û Bêsilehkirinê Menar Gorbî, ji Konfederasyona Sendîkayên Karker ya Îspanyayê Isebal Dutzînsk û li ser navê rêxistinên ku ne bûne dewlet Juan Marco beşdar bûne. Gelek kes û rêxistinan jî bi mesajên xwe beşdarî vekirina buroya ERNK'ê bûn. Ji van kesan Miguel Angel Martinez, Serokê Meclîsa Mebûsên Konseya Ewrûpayê û gelek mebûsên endamên vê meclîsê di vekirinê de xwedî mesaj bûn. Ji rêxistanan jî Partiya Neteweperwer ya Bask (PNV) û gelek rêxistinên demokratîk hebûn.

Çapemeniya Îspanyayê jî wek rojnameyên mezin El Pais, El Munda û Radyoya Neteweyî ya Îspanyayê, di vekirina buroya ERNK'ê de hazir bûn.

Ji hêla din ve, di vekirina buroyê de Berpirsiyarê ERNK'ê yê Îspanyayî Faruk Duru axaftinek kir. Faruk Duru di axaftina xwe de daxuyand ku pirsgirêka Kurd, ji nav hidûdê Tirkiyeyê derketiye û bûye navneteweyî. Li gorî Faruk, bangên PKK'ê yên dialogê her car ji aliyê komara Tirkiyeyê ve bi qetlîaman tê bersivandin. Di dawiya axaftina xwe de Faruk Duru wiha got: "Pêwist e ku dewleta Îspanyayê, li gorî biryara Parlementoya Ewrûpayê ya ambargoya çekan li hemberî Tirkiyeyê, hereket bike." Faruk ji dostên Kurdan jî daxwaza boykotkirina tûrîzma Tirkiyeyê kir.

Piştî axaftina Faruk Duru, Mebûsê Partiya Çepa Yekbûyî Manuel Garcia Fonseca peyivî. Fonseca gote ku PKK li bakurê Kurdistanê nûnerê gelê Kurd e. Fonseca di axaftina xwe de qala vê rastiyê kir û daxuyand ku ewê her gav piştgiriyê bidin buroya ERNK'ê.

Ji Partiya Karker a Sosyalîst Anna Balletbo jî axaftinek kir û li ser çareserkirina pirsgirêka Kurdî ya bi awayê aştî sekinî. Ballet jî di axaftina xwe de gote ku ewê piştgiriyê bidin buroya ERNK'ê.

*Rêxistina Kedkarên Welatparêz ên Kurdistanê (RKWK):*

# 'Bêyî gelê Kurd, Tirk jî rizgar nabin'

**Navenda Nûçeyan–** Şeva 28'ê Avrêlê Rêxistina Kedkarên Welatparêz ên Kurdistanê, li Amedê belavokek li ser cejna 1'ê Gulanê belav kir. Di vê belavokê de, der heqê dîroka 1'ê Gulanê de hinek agahî tên dayîn. Pişt re tê gotin ku li Tirkiyeyê û li bakurê Kurdistanê ji sala 1925'an bi vir ve çînên kedxwar û dagirker hemû hilperîkînên çîna karker û kedkar bi darê zorê pelçiqandine.

Her wiha cejna 1'ê Gulanê jî ji naverokê dûr xistine û wek cejna kulîlk û biharê nîşan dane. Mirovên qîma xwe bi wan neanîne û bi girseyî xwe pêş dane jî, bi zorbazî hatine kuştin. Wek 1 Gulan 77'an ku li Taksîmê 36 kedkar ji aliyê kontrayên faşîst ve hatin kuştin.

Di dawiya belavokê de tê gotin ku hêzên mêtîngehkar bi hilperîkîna şerê çekdarî li Kurdistanê ji her alî ve têk diçe. Pişt re vê derbirînê dike: "Di gel hemû piştdayînên Ewrûpa û DYA'yê, hemû çekên modern û metodên hovane dîsa jî artêşa wan li hemberî gerîla dipelişe. Lewre li hemberî gelê sivîl û bêçek bi kontrayan qetlîaman pêk tîne, gundan vala dike, dişewitîne, mirovên welatparêz dikuje. Di roja 1'ê Gulanê de em bang li hemû mirovên şoreşger, demokrat û sosyalîst dikin ku ji bo bi hev re jiyîneke wekhevî û azad ya gelên me, li hemberî qetlîaman bêdeng nemînin, rê li ber vê hovîtiyê bigirin. Bila bê zanîn ku bêyî azadbûna gelê Kurd, kedkarên Tirk jî qeydên koletiyê rizgar nabin."

# Hilbijartina El Salvadorê

**Nûçeyên Derve–** Li El Salvadorê şerê hundirîn ê ku 12 salan dom kir û 15 mehan berî vê, bi lihevkirineke hikûmetê û Eniya Rizgariya Neteweyî ya Farabando Marti (FMLN), dawî lê hat, bi hilbijartinê kete pêvajoyeke nû. Ji roja ku FMLN'ê çekê xwe danîn heta roja 20'ê Avrêlê ku hilbijartin çêbû, hêzên kujyar li hemberî hevalbendên FMLN'ê şerekî qirêjî meşand, gelek kes hatin kuştin.

Roja 20'ê Avrêlê hilbijartin li dar ket, li gorî encamên nefermî (heta niha % 90 ray hatine jimartin.) Partiya Armando Calderan Sol Hevkariya Komarxwazên Neteweperest (ARENA) % 68 ray standiye û serokkomarî bi dest xistiye. Berendamê FMLN'e Ruben Zamora li dora % 30 ray standiye. Li gorî wan hejmaran, di parlementoya ku ji 84 endaman pêk tê de, ARENA'yê 39 endamtî bi dest xistine, FMLN'ê jî 21 endamtî.

Calderon Sol (45) parêzerekî neteweperest e, têkiliyê wî bi hêzên kujyar re xurt in. Tê gotin ku serkeftina wî dikare aştiyê bixe talûkeyê. Lê wî piştî hilbijartinê daxuyand ku wê ji bo hemû mirovên El Salvadorê kar bike û reformên ku ji bo pêkanîna aştiyê pêwist in, çêbike.



*Alîgirên FMLN'ê li ser cendekê hevalekî wan î ku ji aliyê hêzên tarî ve hatiye kuştin tên dîtin.*

Serokekî FMLN'ê bi navê Joaquin Villalobos ev nirxandin kir: "Em di parlementoyê de hêza duyemîn in û ew mecbûr e ku bi me re li hev bike, aştî jî vê yekê divê."

## Hêzên Tirk nagihin armancê

Operasyona ku hêzên Tirk li başûrê Kurdistanê li hemberî PKK'ê li dar xistin bi awayekî bêdeng û nehênî didome. Rayedarên hikûmeta Tirk tevî serokwezîr Tansu Çillerê, ji raya giştî re daxuyandin ku operasyon qediyaye. Lê ji aliyê din ve nûçe û agahiyên ku digihên me didine zanîn ku leşkerên Tirk hîn li Başûr in û li nêzîkî "Sînorê Tirk û Iraqê" li hev dicivin.

Ev rewşa hêzên Tirk wiha tê nirxandin ku, operasyon bi ser neketiye û civîna wan î li mintîqeya Şivê û bêdengiya wan ji vê yekê re delîl e. Çavkaniyên PKK'ê jî li ser operasyonê diyar dikin ku li hemberî operasyonê amadehiyên wan hebûne û bi şerê partîzanî li hember leşkerê Tirk sekinîne, ji lew re zaiyata wan pir hindik e; lê zaiyateke zehf mezin dane û hêzên Tirk ku ne li hêviyê bûne.

# Başûrî Kurdistan û 1'î Gulan

Kîrêkar im hatûme meydan
Delêm her kare însanî xulqan
Çend sal e deylêm eme biriyar e
Biriyarî rojî yekî Ayar e (Gulan)

Belê, rewrewey pîşesazî cîhan û pêşveçûnî mirovayetî be şan û bazûy kirêkaran û rencderan debizwê, berhem be areq û mandû bûnî ewan dête ber, belam deçête gîrfanî sermayedaran û burjiwakan ewe.

Kêşey nêwan kirêkar û xawen kar kêşeyekî ezelî ye, le gel gorane coberore dîrokîye kan da û gorînî çendîn sîstem û yasa da, em kêşeye goranî ewtoy be ser da nehatwe.

Mirovayetî hergîz birway be hêzî bazûy kirêkar leq nabêt û hemû çawiyan birîwete yekgirtinî kirêkaranî cîhan.

Le başûrî Kurdistan îş hemû salê yadî em roje pîroze dekrêtewe û ahengî taybetî bo saz dekrêt ke sendîkakanî kirêkaran erkî rêxistin û berêwebirdinî ew bone pîroze degrine esto. Em boneye be corêk le amêz dekrêt ke le şîîr, çîrok û şanoy Kurdî da rengî dawetewe be corêk ke çendîn şaîrî mezinî weku Goran, Bêkes, Dîlan û hwd. ş. riyan bo nûsîwe.

Belam le çiwarçêwey dewletî Iraq da bo çendîn sal deçê em cejna gûr û tînî caranî nemawe, çûnke be fermanî resmî dewlet pîşey kirêkarî ret kirayewe û êsta le çiwarçêwey karûbarî resmî dewletî Iraq da çînêk niye nawî kirêkar bê belku hemû fermanber in.

Piştî azadbûnî başûrî Kurdistan yadî em cejne pîrozey kirêkaran zor be ciwanî dekrêtewe û lem roje da krêkaran be rûyekî geş û be dilêkî xoşewe li sendîkay xoyan pêşwazî le çînekanî tirî gel deken, ke be çepke gûlewe deçine serdaniyan û pîrozbayî em cejne taybetiyeyan lê deken. Paşan rû le yekêk le hole gewrekanî şar dekrêt û be pêy bernameyekî rêk û pêk ahengî qeşeng û germ û gûr saz dekrêt ke tiyay da witar û brûskey pîrozbayî hemû layn û rêkxirawekanî tê dadexwênrêtewe paşan be çendîn srûd, stran, operêt û helbestî taybet be xebatî kirêkaran ahengeke derazênrêtewe.

**PISMAM**




***1'ê Gulana 1994'an di gel şerê ku li Kurdistanê hilperikî û pakêta Tansu Çillerê bû xwediyê wateyeke nû ji bo karkeran û bi vî giyanî wê Cejna 1'ê Gulanê li Kurdistan û Tirkiyê bi xwepêşdanên girseyî bê pîrozkirin.***

# Jiyana bêîdeal ji mirinê xerabtir e

Şoreşa yekemîn a sosyalîst ku di oktobira 1917'an de li Rûsyayê bi serket, hemû zehmetkêş û netewên bindest ên cîhanê, ji bo jiyaneke dewlemend, wekhev, azad û serbixwe kir xwedî hêvî, ji wê rojê heta îro hemû gelên bindest, karker û xebatkar, xwendekar û ronakbîr bi bîr û bawerî yên sosyalîzmê xwe perwerde kirin û her tim, di her qada jiyanê de aktîf bûn, bi hêvî û bi îdeal bûn. Bi taybetî cîwanên xwendekar ji bo bîr û baweriyên şoreşger meraq û înterese nîşan didan. Bi vî awayî li hemû parzemînan (qitan) ronakbîrên pêşverû bi alîkariya girseyên gel û çînên bindest xwe organîze kirin, komele û partî ava kirin, di şerê siyasî, sendîkayî û çekdarî de beşdar bûn. Li dijî faşîzmê û rejîmên dîktator li ber xwedan. Li hin deveran derbên mezin xwarin, lê li hin cihan jî bingeh ji bo pêşerojê ava bû.

Her çiqas şoreş, serîrakirin û protestoyên van 76 salan qet li deverekê wekhevî û azadiyeke bingeh dernexistin holê jî, ew şoreş û têkoşîn, gavên girîng ên dîrokî bûn ku şoreşên pêşerojê xwe li ser van tecrûbe û ceribandinan nû bike û di avakirina civakên azad û wekhev de bi serkeve. Her çiqas encama van tevger û têkoşînan bersiva daxwaza gel û çînên bendest û nedewlemendan nedabe jî; ji bo şoreşê xebat bi rûmet bû, îdealeka bingehîn a mirovahiyê hebû. Xelk ji bo rojên ronahî bi hêvî bû. Jixwe mirov bi xewnên xwe, bi hêviyên xwe dijî. Heta çend sal berê jî mirovatiyê di rojên pêş de ronahî didît, nan û azadî didît, wekhevî didît, jiyaneke bêderd, bêêş, bêkotek û bêkul didît.

Ev tesîr di dawiya salên 1960'î de gihîşt zanîngehên Tirkiyeyê û her wiha xwendekar û rewşenbîrên Kurd. Di wan salan û çend sal berê herdu cûntayên dawîn de, rewş wisa bûbû ku hema hema bi milyonan xort û keçên xwendekar, ronakbîr û karmend û karker bûbûn çep û sosyalîst. Ew kes her çiqas bi kûrahî girîng û cidîbûna pirsa sosyalîzmê û şoreşê û ji bo vê pêwistbûn û hewcedariya rêxistin tevger girsên gel û têkoşînê fêm nekiribin jî, dîsa jî baweriyeke îdeolojî bi marksîzmê, yanî bi mimkûnbûna guherandinê dihat û dil û mêjiyên milyonan bi hêviya civata sibehîn a wekhev û adilane tije bû. Yanê çepên cîhanê wek îro beredayî nebûn; bêxewn, bêhîs, bêbawerî û bêîdeal nebû. Ev milyon îro ji bo rojê dijîn. Îdeolojî, terorî ji bo wan mirin e. Ji bo pêşerojê plan û program; ji bo biratî, wekhevî û dewlemendkirina civatê serî êşandin tune ye. Mêjî, ziman, cih û dil êdî ne behsa mêtingehiyê dikin û ne jî ew bîna azadiyê dikarin hîs bikin. Dewlemendan, dîktatoran, împeryalîzmê û kedxwaran çi dan gel dan, tiştekî nedin jî, girseya gel li dû heqê xwe negere û bi zorê heq parastin jî îro ne armanca kesî ye. Ji ber ku mirovatî bêhêvî û bêîdeal maye.

Di destpêka salên 1970'ê de ji bo Vîetnamê û ji bo gelê Filîstînê li dijî Amerîka û Îsraîl; ji bo gelê Şîlî li dijî cunta Pinoche; ji bo Angola û Mozambik gelek xebat û çalakî bûbûn karê gelek mirovên pêşverû û sosyalîst. Li Tirkiyeyê, di protestoya li dijî fîloya Amerîka de çi nebûbû ku. Heta ji gelek welatên Ewrûpayê di nîvên salên 1970'î de, dema ku belediyeyan fiyetên bilêtên otobûs an jî metroyan biha dikirin; yan jî çend karker ji fabrîqeyan dihatin derxistin; çepan, sosyalîstan hezar çalakî li dijî burjûwazî û dewletên kapîtalîst derdixistin holê û rewşên mêtingehî bi hezar an belavok dihat protesto kirin.

Lê îro rewş pir hatiye guhertin. Bi têkçûna sîstema Sovyet û reel sosyalîzmê, li gelek welatên ku partiyên çep yên sosyalîst ku ji bo avakirina civata sibehîn alternatîf bûn, îro pir qels in û ber bi mirinê ve diçin. Îro motora pêşvexistina yên ku civatê bikaribin biguherînin, ne di nav girseya gelan de û ne jî ji aliyê çepên berê ve têne parastin. Ew rewş di van çend salên dawîn de pir vekirî eşkere bûye. Ji ber ku îro tu kes ala mirovahiyê ji bo mafên bingehîn hilnagire. Tu rêxistin û partî hevkarî ji bo gel û çînên bindest nîşan nade. Ma îro ji doh baştir e? Ma dagirkerî û mêtingehiya îro ji a duh qat bi qat zêdetir nîn e? Helbet zêdetir e. Lê îro mirovahiyê ji sibe hêviya xwe biriye. Bêîdeal mirovahî ber bi rojên hîn xerabtir diçe.

Ev bûyerên çend salên dawîn jî baş dan xuyakirin ku êdî li cîhanê çi dibe bila bibe kes dengê xwe bilind nake û xema kesî jî nîn e. Sovyet hilweşiya kesî dengê xwe nekir, Yogoslaviya hildiweşe kes deng nake, Yekîtiya Neteweyan Iraq hilweşand kesî deng nekir. Kurdistan tar û mar dibe û her roj nêzîkî pêncî kesî tên kuştin, xema kesî nîn e. Dîsa kirinên Yekîtiya Neteweyan li Somaliya kesî interese nake. Kuba li ser pîyan mabû, ew jî wê hilweşe, jê qet çepek ne hevkarî û ne jî alîkariya xwe diyar dike. Ev çawa mirovahiye ku îro ji bo mirovatiyê, wekhev û azadiyê bêdeng e, bêtêkoşîn e.

Helbet îstîsna hene. Tevger û têkoşîna gelê Kurd yek ji van e. Ji bo gelê me hîn her tişt xelas nebûye. Hîn gelê Kurd ji sibehê bi hêvî ye. Têkoşîna îro vê eşkere dike. Di bingehê de îro însanetî di nav Kurdan de, li Kurdistanê dijî. Gelên bindest ên cîhanê dikarin di têkoşîna Kurdan de, bi serkeftina şoreşê, bi azadbûna gelê me, hêviya ku îro li her deverê winda bûye, bi dest dixînin û dîsa bibin xwediyê îdealên bingehîn ên mirovperver. Helbet di civaka me Kurdan de hin kesên çep yên berê jî hene ku îro bi tevayî bêhêvî li pêşerojê dinêrin. Ji wan re mirov dikare bibêje; ewqas bêhêvî, bêîdeal nebin. Hêvî nîvê serkeftinê ye. Divê mirov xwedî îdeal, alî û piştgirê tevger û têkoşînek îdeal be.

**M. Ali Tüysüz**

Neqtik



*Rast bifikire, rast bibêje û rast pêk bîne.*

***Zerdeşt***

**KÊ ÇI PEKAND?**

**Ev welat welatê me ye. Ev krîz krîza me ye!**

*Medyaya Tirk*

# Ekonomiya Tirkiyeyê hêka çiyayiyan



Di dîroka civakan de civak, beş bi beş ji hev cudan e û zanetir û medenîtir in. Zanetî û cahiltiya civakan girêdahiyê têkiliyên wan ên bi civakên nûjen (modern) re ne. Ev civakên han pele bi pele ne; çiyayî (yên ku li çiyan dijîn), deştî, gundî û bajarî ne. Çawa tê zanîn civaka medenîtirîn "bajarî" ne. Bajarî ji her hêlê ve ji van civakên din nûjentir in.Yên cahîltrîn jî "çiyayî" ne. Cahilmayîna çiyayiyan jî, ji ber ku tim di warê xwe de mane, têkildarî civakên din nebûne û bê dibistan bûne.

Belê, me got çiyayî. Em tên ser babeta xwe. Rojek yekî çiyayî yê ji gundê asê ji bo karê xwe berjêrî deştê dibe. Li deştê matmayî dimîne, deşt hingî ji çiyayî re azayî (rast e) ye ku, êdî nizane bi rê ve here. Her wiha ew riya xwe dom dike ta "Çemê Kanîsîmo." Çemê Kanîsîmo jî tev debir in, debirên titûnê, kunciyan û zebeşan in . Gava çiyayî çav bi zebeşan dikeve ji xwe re şaş dimîne, li zebeşan dinêre, dimêzîne, tiştek fêm nake û nizane ev çi teva ne.

Çiyayî meraq dike û diçe ba debirvan (xwediyê zebeşan) û dipirse:

– Ooo qurban! Ev çi ne wisa mezin, hilû, gilover û giran ?

Debirvan, fêm dike ku, ew çiyayî ye û dixwaze hinek bi wî tinazan bike.

– Ev hêkên mehînê ne.

– Ooo tu bidî xatirê Xwedê! Inca ew çawan in gelo ?

– Ev hêkên han piştî çendakî dizên û ji nava wan canîyek dertê. Tu jî, dê vê canîkê xwedî bikî, ew jî dê bibe hesp ji te re.

– Êêê, wile zehf baş e. Ka, bihayê yeka wan bi çî ye ?

Debirvan, zebeşekî difiroşe çiyayî û çiyayî jî biyokekê dibire û di zebeşê re derbas dike, dide ser milê xwe û bi riya malê dikeve. Çiyayiyo, diweste li serê palekê rûdine, cixareyekê dipêçe, zebeşê wî jî ji nîşka ve digingire newalê nav dehl û deviyê. Tesaduf kêvroşkek li nav deviyê ye. Kêvroşk ji zebeşê ditirse û direve. Çiyayî jî zen dike, canîka wî ye ji xaşikê derket û direve. Kêvroşk direve çiyayî jî li dû kêvroşkê dibeze û gazî kêvroşkê dike:

– Dibuşşşş, dibuşşşş qurban dibuşşşşşş ! Bê bê, tay têy qurban têy ! Bê qurban ez xwediyê te me, were qurban ! Bê em herin mala xwe. Bê qurban bê. Hoooo ! Ez evdal im çi canîkî rewan e. peh !..

Bi vî rengî kêvroşk û çiyayî li dû hev di neqebê de winda dibin.

Ekonomiya Tirkiyeyê jî, bûye mîna kêvroşka wî çiyayî ku bi bayê bezê dibeze û kesek nagihijê. Hey Tansu Xanim li dû ekonomiya Tirkiyeyê dibeze hew dibîne ku li Amerîkayê ye. Amerîka jî di dewsa zebeşê de pênc hêkên Amerîkî dide xanima Amerîkî (Tansu), lê pênc hêk (pênc milyar dolar) ancax têrî firavîneke bike, dê bêşîv û taştê çawan bike. Divê dîsa bi parsê bikeve, lê li ku, ji kê?

Lê, mixabin êdî kes ne bi ekonomîstiya Çiller Xanimê û ne jî bi ekonomiya Tirkiyeyê ewle dibe. Ji bo ku rewşa Tirkiyeyê ya krîza cengê li ber xwe bide, paketa ekonomiyê vekir û bi awayekî wisa vekir ku gel serhildan çêkir. Wisa xuya ye ku êdî karmend, karker, xebatkar, gundî, dewlemend, têcir û ta bigihîje parlementeran jî paketa derbeya ekonomiyê xwarin. Ji xeynî van tevan jî, wek weqfek an jî mizgeftek her bexş û hîbeyan dipejirîne, ji niha ve hinek parlementerên wê ku bi milyaran pereyên dewletê xwarine, wek zehf welatparêz bin meaşekî xwe dibexşînin xezîneya dewletê. Ma gelo, ew bi xwe dê çiqas bibexşîne!.. Em hêvîdar in hejarên ku nikarin debara xwe bikin xayîn neyên îlankirin, ji ber ku meaşên xwe nikarin bidin Xanimê.

Li gorî hinek remildaran (Medyûmên ku niha di bendixaneyê de ne) riya Amerîkayê xuya ye ji Çillerê re, di van rojên nêzîk de. Kesên ku Çiller ji wan re dibêje zarokên min li dû wê avê narijînin. Ev jî tê wateya: "Çûyîn hebe, vegerîn hîç tune be!"


**S.S.DILPOLO**

## *Kifir Ehmed*

Delên... ke "mangakey nexweş kewt, taze Kifir Ehmed destî le niwêj berdabû. Deywit: "Bes e zorim boy kird û sûdim lê nedî!. Xelk û Xwa dewriyan da û pêyan wit: "Hemûy hî em kifrane ye awa malî xot wêran dekeyt, de heste çiwar rikat niwêj bike û rû bikere qapî Xwa, belkû xwa rehmêkit pê bikat û derûyekî be xêrit lê bikatewe." Kifir Ehmed çarî nema û neytiwanî le qiseye ew xelke derçê hesta desnwêjî girt û rûy kirde qapî Xwa, diway ewey çendîn rikat niwêjî kird, be hîway çabûnewey manga kewe ma, balam paş çawerwaniyekî kem mangake be laya hat û mirdarewe bû. Dinya rûwew zistan deçû ke taqe "bizin" ekeyşî nexweş kewt, dîsanewe dewriyan da û teklîfî niwêjkirdin û rû le xwa kirdinyan lê kird. Kifir Ehmed îş dîsan destniwêjî girt û çend rikatê niwêjî kird û be dil hîway ewey le Yezdan xwast ke ew taqe biziney bo bihêlê. Belam ewîş be derdî mangakey paş maweyekî kem be lada hat û mirdarewe bû.

Behar bû, Kifir Ehmed aciz û xembar danîştibû; le malî dinya da yek nêrekerêkî hebû, xeyalî royştibû. Belam nêrekere bor zerînêk dezerî dewr û berî xoy hejandibû. Kifir Ehmed zor lêy bêzar bû, awirêkî le nêrekere bor dayewe, temaşayekî kird û witî. "Piyaw debî yan hestim çiwar rikat niwêjit bo bikem?"

**Jûjî...** **Doğan Güzel**



# Hêviya dewletê: Çapemeniya derewîn

**Nûçeyên Cengê–** Li Kurdistanê û li Tirkiyeyê têkoşîna rizgariya gelê Kurd di her warî de didome. Hemû dinya dibîne ku şerekî dijwar di navbera PKK'ê û dewletê Tirk de heye û roj bi roj dorfirehtir dibe. Têkoşîna ku PKK'ê, pêşî li çiyayên Kurdistanê dest pê kir, niha li çar aliyên Kurdistanê, li bajar û navçeyên Tirkiyeyê û li gelek welatên biyan bi awayên cur be cur pêl dide.

Tevî vê yekê dewleta Romê bi tu awayî bi devekî fermî navekî li vê cengê nake, çawa ku tu tişt neqewimîbe daxuyaniyên derewîn diweşîne. Li aliyekî %50'yê butçeya xwe ji mesrefên şer re vediqetîne, bi sedhezaran leşker, tîmên taybetî, cerdevan û sîxuran li Kurdistanê bi cih dike, bi çekên herî modern çiya û deştên Kurdistanê bombebaran dike, her roj bi dehan kesên sivîl digire, di îşkenceyan re derbas dike, dikuje û gelek tevgerên dijmirovî pêk tîne, li aliyê din jî dibêje, "Dewleta me bi tu rêxistinê re ne di şer de ye."

Bi mebesta veşartina vî şerî, çapemeniya Tirk ji berê ve dihate bikaranîn. Gelek rojnamevan û gotarnivîsarên çapemeniya Tirk di xizmeta dewletê de bûn. Niha, ji xeynî rojnameya Özgür Ülkeyê, hemû rojnameyên rojane û kanalên TV'yê yên Tirk ketine bin xizmeta dewletê û wek karmendên wê dixebitin. Di hin mijaran de her çendî ev rojname û kanalên televizyonan helwestên cihêreng nîşan bidin jî di mesela PKK'ê de giş bi yek dengekî û bi yek berçavkekê diqîrin û li bûyeren dinêrin; kirinên qirêj ên dewletê vedişêrin, rastiya bûyeran berevajî dikin. Yên ku pariyek jî rastiyê tînin zimên, tên cezakirin, îşkencekirin û kuştin. Yên li pey dewletê diçin û li gor dilê wê dinivîsin jî, ji aliyê dewletê ve tên xelatkirin.

Çapemeniya Tirk îro bûye navgîna şerê psîkolojîk yê herî bi tesîr û ji ber vê yekê îsal bi trîlyonan TL pere ji aliyê dewletê ve wek teşwîq lê hate belavkirin. Tenê rojnameya Sabahê 170 milyar TL wek alîkarî ji dewletê stand.

Nûçeyên çapemeniyê yên der barê têkoşîna gelê Kurd de giş eynî ne. Zehfê caran manşetên sê çar rojnameyan eynî ne. Agahiyên ku wek nûçe didin jixwe dîsa eynî ne ji ber ku hemû nûçeyên xwe ji Waliyê herêmê û ji Artêşa Tirk an jî, ji MÎT'ê Tirk distînin. Wekî din hemû nivîskarên wan ên qunciкan jî bêyî ku herin li Kurdistanê bigerin ew jî van nûçeyan teyîd dikin.

Ev derew û nûçeyên berevajîkirî yên çapemeniya Tirk her roj hemû kes dikare bi hêsanî bibîne.

Bi taybetî rojnameya Sabahê, vê meha dawîn, pêşkêşiya belavkirina van derewên mezin dike.

Hefteya dawî rojnameya Sabahê bi ekîbeke ku ji Hasan Cemal, Cengiz Çandar, Ramazan Öztürk û Salih Memecan pêk hatibû, çû Kurdistanê. Ev sefera Sabahê bi alîkariya Waliyê Herêmê Ünal Erkan û bi hevalbendiya tîmên taybet li dar ket. Agahiyên ku vê ekîbê de Sabahê de weşandin ji rastiya Kurdistanê pir dûr bûn û li gor daxwaza rayedarên dewletê hatibin nivîsandin.

Ji nivîsa Ramazan Öztürk dereweke balkêş em dixwazin bidin. "Li Silopî û Hezexê (Îdilê) zarokên Kurd êdî di şûna îşareta zaferê de ya 'Bozkurtan' ya dêleguran (ku îşareta faşîstên Tirk e) dikin."

Ji derewan re jî gerek e sînor hebin. Bes ji bo çapemeniya Tirk û rojnamevanên wê yên bê rûmet sînora derewan tune. Silopî û Hezexê li navenda Botan in. Di dîroka Kurdistanê de faşîstên Tirk carekê tenê jî ofîsek an jî partiyek li Botan nekarîne vekin ji ber ku ji xeynî polîs û çend karmendên Tirk ên faşîst yek terefdarên wan bi tenê jî tune. Li cihekî wisa li gor Ramazan Öztürk (Öztürk ango Tirkê rasteqîn yanê nîjadperest) zarokên Kurd êdî li pey şopa Türkeşê faşîst diçin. Derewên wek yên Ramazan Öztürk her roj em dixwînin di rojnameyên Sabah, Hürriyet, Türkiye, Milliyet, Günaydın û hwd. de. Kes bi derewan namire, di ser re jî li Tirkiyeyê kî ji bo berjewendiyên dewletê derewan bike, pereyan jî kar dike.

Îro ev çapemeniya derewîn bûye hêviya dewleta Tirk a ku di her hêlê de hemû hêviyên xwe winda kirine.

# Li Stockholmê şeva piştgiriya Welat

**Swed, Welat–** Stockholm: Yekîtiya Rewşenbîrên Welatparêzên Kurdistanê (YRWK) Beşê Swêdê, di roja 29.4.1994'an de, li Stockholmê şeva alîkarî û piştgiriya rojnameya Welat û kovara Rewşenê li dar xist. Di şevê de bi qasî 400 kesî beşdarî şevê bûn. Ji PEN'a Swêdê nivîskar Margareta Strömsted, ji rojnameya Norskens Flammans Îmformation Mats Ejmarson û ji rojnameya Proletern jî Roger Gross beşdarî şevê bûn. Herşêyan jî mesajên xwe bi xwe pêşkêşî şevê kirin. Di mesajên xwe de piştgiriya xwe ya bi rojnameya Welat û kovara Rewşen re dan diyarkirin û zilm û zordariya ku li ser gelê Kurd û çapemeniya wê heye, anîn zimên. PEN'a Swêdê da diyarkirin ku ji bo nivîskar û rojnamevanên Kurd û Tirkên ku ji bo nivîs, berhem û dîtinên xwe di zîndanên Tirkiyeyê de ne, xebateke bi rêk û pêk didomînin. Ji bo berdana wan xebat dikin û hewlê didin ku vê pirsê bibin cem dezgehên navneteweyî.

Hunermend Nasir Razazî, Birîndar û Şiyar şeva piştgiriyê bi stranên xwe geş û xweş kirin. Koma Amedê bi lîstikên Kurdî şev rengîn û dewlemendtir kirin. Helbestvan J. Espar, M. Mayî û Sefkan jî, bi helbestên xwe beşdar rakirin ser piyan. Amed Tîgrîs bi Kurdî û Şerefxan Cizîrî jî, bi Swêdî di çapemeniya Kurdî de li ser girîngî û rola Welat û Rewşenê rawestiyan û zordarî û çewsandinên dewleta Tirk a li ser rojname û kovarên Kurdan anîn zimên û der heqê kampanyaya abonetiya Welat û Rewşenê de agahdarî dan beşdaran.

Di şevê de kampanyaya abonetiyê hat domandin, maseyên weşanên Kurdî hatin vekirin, xwarin û vexwarin hatin firotin. Hatina di şevê de ji rojnameya Welat û kovara Rewşenê re wê bê şandin.

Di şevê de Amed Tîgrîs li ser navê Welat ev axaftin kir. "Li weşanên Kurdî xwedîderketin, li ziman, edebiyat û kultura xwe xwedîderketin e. Li ax û mirovên Kurdistanê xwedî derketin e. Ma nîştimanperwerî çi ye? Nîştimanperwerî, xwedî li ziman, edebiyat, kultur, edet, ax û mirovên xwe xwedî derketin û parastina wan e. Ji bo van tiştan, mirovên Kurd bi salan xwîna xwe rijandine û bêhejmar şehîd dane û didin.

> Rojnameya Welat bi derketina xwe re, ew kilît, qeyd û bend û qedexeyên 700 salî dirandin û şikandin. Welat dengê şoreşê yê bi Kurdî ye. Yanî dengê xwediyê xwe ye. Kelemê nav çavê dijmin e. Ji ber van sedeman dewleta Tirk bi hemû organên xwe yên êrîşkar ve, bi dijwarî dajo ser rojnameya Welat. Heta niha du nivîskarên wî şehîd kirin: Musa Anter û Hüseyîn Deniz. Dewleta Tirk ji gelekî aliyan ve êrîş dibe ser rojname û kovarên Kurdan.

**WELAT QEYD Û BEND Û QEDEXEYÊN 700 SALÎ ŞIKAND**

Rojnameya Welat bi derketina xwe re, ew kilît, qeyd û bend û qedexeyên 700 salî dirandin û şikandin. Welat dengê şoreşê yê bi Kurdî ye. Yanî dengê xwediyê xwe ye. Kelemê nav çavê dijmin e. Ji ber van sedeman dewleta Tirk bi hemû organên xwe yên êrîşkar ve, bi dijwarî dajo ser rojnameya Welat. Heta niha du nivîskarên wî şehîd kirin: Musa Anter û Hüseyîn Deniz. Dewleta Tirk ji gelekî aliyan ve û êrîş dibe ser rojname û kovarên Kurdan. Dewlet û hikûmeta Tirk li hember raya giştî ya cîhanê û bi taybetî li hember raya giştî ya Ewrûpayê taktîkên cuda bi kar tîne. Bi awayeke resmî û vekirî bi lez û bez êrîşê ser rojnameyê nake. Lê, bi dizî, metodên şîdetê bi kar tîne. Nahêle bê belavkirin. Şirketên belavkirinê bi gef û guran digire û nahêle ku belav bikin. Ew kesên ku Welat li ser, li mal an li cihê karê wan bên dîtin, digirin û davêjin girtîgehan. Bi ser re jî, ev çend car in ku wezîrên hikûmeta Tirk di pres-konferans û daxuyaniyên xwe de didin diyarkirin ku, "zimanê Kurdî hebe jî, ji tiştekî re nabe. Li Stenbolê rojnameyek derxistin, lê piştî du sê mehan kesî nexwend û niha li ber girtinê ye." Ew dixwazin bi vî awayî raya giştî ya cîhanê bixapînin û hwd. derewan bikin.

Belê rast e, zilm û zor û qedexebûna dewleta Tirk a li ser weşanên Kurdî gelekî vekirî û eşkere ye; lê belê, di vir de sûc an jî kêmahiyên me Kurdan jî tune ne? Belê, hene û hem jî çawa! Me riyeke hêsan dîtiye û dixwazin xwe jê rizgar bikin. Her dema ku em dikevin tengasiyê, "ma ez çi bikim Kurdiya min ne baş e. Ev jî ne sûc û gunehê min e, yê dijmin e..." û hwd û em xwe diparêzin an jî heq didine xwe. Ev mentiq ne rast e. Ev cureyê xweparastinê mirov li ava zêr û zîv naxe û pê paqij jî nabe. Divê herkes bikeve bizanibe û bikarbîne, nekê xwe bigivêje û serê xwe biêşîne. Ji bo ku kêfa dijmin jî neyîne, ne bi du destan bi çar destan xwedî li weşanên Kurdî derbikeve. Perwerdeyê bi xwe dest pê bike. Heger em dixwazin ji vî dijminî, bi lez û bez û yekcarî dûr bikevin û rizgar bibin, pêwist e ku dîwarê ziman û kultûrê bixine navbera xwe û Ereb, Ecem û Tirkan. Hemû xebatên ziman, edebî, huner û kulturî bixine rê û xizmeta şoreşê ku rojeke zû Kurdistan rizgar bibe. Incax û incax bi rizgarbûna Kurdistanê re ziman, edebiyat û kultura me jî dikare rizgar dibe. Ev herdu bi hevdu ve girêdayî ne û tesîrên mezin li ser hevdu dikin. Ji ber van sedeman divê em Kurd giranî bidine weşanên Kurdî, bikirin, bixwînin û belav bikin. Bi taybetî em Kurdên li Ewrûpa, di vî warî de piçek xwe bijdînin.

**DI ÇAPEMENIYA KURDÎ DE GIRÎNGÎ Û ROLA WELAT**

Rojnameya Welat di nav rojname û weşanên Kurdî de cihê xwe yê girîng û taybetî heye. Hem ji aliyê naverok û hem jî, ji aliyê çarçove û qada neteweyî û belavbûnê ve. Welat ne wekî hinek kovar û rojnameyên Kurdî, weşaneke biçûk û lokalî ye. Ew ne bi tenê li her çar parçeyên Kurdistanê, herwiha li seranserê cîhanê belav dibe. Ji Kazakîstanê heta Amerîka. Ji Îngilîstanê heta Awûstralyayê. Ji Swêdê heta Lîbya û Sudî Erebîstanê. Welat heta niha di bin hemû zordarî û tehde û çewsandinên dewleta Tirk de, her hefte bi rêk û pêk 114 hejmar derketiye. Di çapemeniya Kurdî de ev rekor û serfiraziyeke mezin e. Di warê weşanî de mirov dikare bibêje rojnameya yekemîn e ku ziman û têkiliyên her çar parçeyên welatê me û hemû Kurdan bi hevdu ve girêdide. Wan ji hevdu agahdar dike. Di warê nêzîkbûna zimên û hestên neteweyî de, roleke mezin dilîze.

Ez li ser navê rojnameya Welat û kovara Rewşenê ji we hemûyan re spas dikim ku hûn hatin û beşdarê şevê bûn. We di şeveke wiha de piştgirî û alîkariya xwe da diyarkirin.

Em spas û rêzgirtinên xwe pêşkêş dikin!"

NÊRÎNEK

# Derewên spî

Derew û rastî bi hev re hene. Pirî caran li ser rastiyê gotûbêj nayêne kirin. Rastî pirî caran weke pirseke felsefî têye dîtin. Lê, ew, bi qasî ku pirseke felsefî ye, pirseke pir praktîk e jî. Ji ber ku rastî weke têye zanîn rast e û zanebûneke pozîtîv e. Ma mirov dikare ji dost û dijminê xwe re bibêje; çima te rastî got lo? Lê, ji dost û dijminan re bi hêsanî mirov dikare bibêje; te çima derew kir lo? Rastî parastin û gotin divê her gav îdeal be, ji bo mirovan û mirovatiyê. Ma Zerdeştê mezin nedigot: Rast bifikire, rast bibêje û rast bike. Her çiqas rastiya dema Zerdeşt, ya felsefa wî bi xwe bû jî, dîsa rastî gotin û rastî parastin weke normeke pir baş dihate dîtin. Rastiya dema me weke tê zanîn rastiyeke din e. Huner ew e ku mirov rastiya dema xwe zeft bike û bernede. Mirov dikare wê zelaltir û ronîtir bike. Ev yek pir eşkere ye. Ji ber ku pirî caran di dîrokê de rastî di bin tarîtî û gemarê de winda dibe. Di demê wiha de divê ew ji pir aliyan ve bê ronahîkirin. Rastî ji aliyekî ve jiyan e, evînî ye, berxwedan e û xebat e. Ma mirovê ku evîndar nebe, li ber xwe nede, xebatê neke û nikaribe bijî, ewê çawa bikaribe rastiyê zeft bike? Rastî bi hemû awayî çalakî ye û tevger e.

Ew ji aliyekî ve xweza bi xwe ye jî û pêşiya pêşî ji xwezayê derketiye. Mirov weke hebûn, bêşik rastiyek ji xwezayê ne. Ew bi awayekî kûr xwenaskirin e. Rastî gotin û rastî parastin bi xwe huner û mêrxasiyê dixwaze.

Xebata polîtîk, bi hunermendî û felsefî, bi zelalkirin û ronîkirina rastiyê re dikare bi pêş ve biçe. Ew dikare bibe malê hemû tevger û hemû civatan, lê tu carî nikare têkeve binê monopola kes û tevgeran. Kesê ku rastiyê dibêje, jê re dibêjin Rasto. Rastî û Rasto divê destbirakê hev bin. Kesê ku ji rastiyê bireve an jî wê veşêre, di esasê xwe de ji xwe direve. Di hemû kom û civatan de, Rasto her gav divê hevalbendê rastiyê be. Wexta ku ew herdu alîkarî û piştgiriya hevdu nekin, mirov di civatê de ber bi bêexlaqiyeke mezin ve diçin. Civata ku hejmara Rastoyan tê de pir be, bi hemû awayî ber bi başiyê ve diçe û civata ku hejmara wan tê de kêm be, bi hemû awayî ber bi xerabûnê ve diçin. Ev yeka hanê qanûnekî sosyal û dîrokî ye.

Heger li Kurdistanê Rasto bibin malzemeyê muzeyan, ew dê welat ber bi tarîtiyê ve biçe. Ew divê bi mêrxasî li welat derkevin meydanê û derewînên demê mehkûm bikin. Di dema derewînan de, kesê fenek û oportunîst derdikevin pêş. Civat û kesê ku fenek û oportunîst in, divê bi hemû awayî bêne rexnekirin.

Tevger û civata ku rastî ji xwe re kirine sembola xebatê, her dem bi pêş ve çûne û mirovatî jî bi pêş ve birine. Ma ku ew (rastî) nebe norm ji bo mirovan, bîrewerê weke Marks mimkûn in? Ma ku ew nebe, Galileu mimkûn e? Ma ku ew nebe Newto û Einstein mimkûn in? Ma ku ew nebe xelasbûna mirov û mirovatiyê mimkûn e? Na û sed carî jî na! Tenê rastî û Rasto dikarin mirovatiyê bi pêş ve bibin.

Gotineke pêşiyê Tirkan heye: "Yê ku rastiyê dibêjin ji neh gundan têne qewirandin." Heger derewîn ne bi tenê ji neh, lê ji noht gundan jî rastiyê biqewirînin, divê dîsa ji mirovatî xwedî li rastiyê derkeve. Rastî divê bibe pusule ji bo me.

Rastiyê heta niha jiyan derxistiye meydanê, wê berhem afirandine, mirov ronahî kirine. Lê, ma derew û derewînan heta niha ji bo welatê me û mirovatiyê çi kirine?

Heta dereceyekê di nav pir mirovan de, derew weke huner jî têne dîtin. Ne bes tenê derewan, lê derewa spî jî dikin! Weke tê zanîn di navbera derewên spî û rastiyê de mûyek pir biçûk heye. Ku mirovên me vî mûyê biçûk di wextê wê de nebînin, ewê derewê spî bikevin şûna rastiyê.

Em hemû dizanin ku babetê derewan pir in. Derew hene ku zirara wan nagihe tu kesan. Ji bo mînak em dikarin wiha bibêjin: Kesê ku bi nexweşiyeke dijwar ketibe, pir caran doxtorê wan nikarin rastiyê ji wan re bibêjin. Doxtor hêviya nexweşên xwe naxwazin bişkînin. An jî carina mirov dikare ji nezantî û bêhemdê xwe derewan bike. An jî pir caran mirov naxwazin û nikarin hemû rastiyê bibêjin. Encamê vê yekê dikare wext be, dikare nezanbûn be, rewş dikare musaît nebe û pir tiştê din...

Derewên wiha zirarê li tu kesî nakin û bi hişmendî nehatine gotin. Armancên wan derewan raste rast ne xapandina mirovan e. Ji ber vê yekê jî ew derew dikarin heta dereceyekê bêne efûkirin û jibîrkirin. Jiyan di vî warî de pir dewlemend e. Pir kes dikare di vê mijarê de jiyana xwe mînak bigire.

Lê mijar û rexnegirtina me li vir derewê bi zanistî û bi hişmendî ne. Bi taybetî jî derewên polîtîk û felsefî ne. Derewên ku dikarin civatê bixapîne, fitneyê bike, şer derxîne. Derewên ku dikare bibe encamê kuştina mirovan û xayintiyê pêş bixe. Derewê ku ji bo menfeetê biçûk menfeetê mezin nebin. Derewê ku xelkê bixapînin û derewê ku ji bo kêçeke biçûk lihêfeke mezin bişewtînin. Bi kurtasî rexne û mijara me derewê spî ne..

**Şerefxan CIZÎRÎ**

*PKK'ê biryarên Konferansa Neteweyî ya Sêyemîn daxuyand:*

# 'Bergeha şer fireh dibe'



**Navenda Nûçeyan–** Partiya Karkerên Kurdistanê, biryarên Konferansa Neteweyî ya Sêyemîn beyan kir. Di nav biryarên konferansê de ku di navbera 5-15'ê Adara 1994'an de pêk hat de, pêkanîna Meclîsa Neteweyî jî heye. Li ser stratejiya şer jî didine zanîn ku bi giştî ji qonaxa parêziyê derketine û derbasî hevkêşeyê (dengeyê) bûne. Heta pê de diçin û derdibin ku li hin deveran gihiyane qonaxa êrîşê.

Di nav biryaran de tê xuyakirin ku hemû dezgeh û saziyên ku ji şerê qirêjî yê Komara Tirk re dibin piştek hedef in û wê şer li Tirkiyeyê jî belav bikin.

Biryarên ku hatin daxuyandin bi vî awayî hatin rêzkirin:

A) Hedefên Siyasî:

– Tesfiyekirina hemû rêxistinên wek, komele û partî yên ku mêtingehkariyê dinûnerînin (temsîl dikin)

– Qedexekirina hemû navgînên (aletên propagandayê (radyo, TV, rojname, kovar û hwd) yên şerê taybetî yê Komara Tirk û rêlibergirtina xebata wan

– Bi awayên ji hev cihê tesfiyekirina saziyên çandî û hêvotinê (perwerdeyê) yên mêtingehkariyê

– Tesfiyekirina hemû organên Komara Tirk ên qanûnçêkirinê, birêvebirinê û nûnerîtiyên wan

– Rêlibergirtina xebitîna daraziya Komara Tirk û tesfiyekirina wê

– Teşhîr û tecrîtkirina hemû çalakiyên Komara Tirk ên li qadên navneteweyî û gurkirina xebatên bi vî awayî

– Tesfiyekirina hevkarên cigehî, çetevanî û ajantiyên Komara Tirk ên li Kurdistanê ku piyên wê yên civakî ne.

B) Hedefên Aborî:

– Hemû sazî û dezgehên ku şerê qirêjî yê ku Komara Tirk dimeşîne fînanse dikin hedef in. Di vê çarçoveyê de dezgehên tûrîzmê, dezgehên madenê, xetên boriyê yên petrolê û dezgehên petrolê, kanên enerjiyê, santralên termîkê, fabrîqe, pîşesaziya çekan, sîstemên rêgihandin û ragihandinê û hemû saziyên aborî yên biçûk û mezin hedef in. Rûxandin, nexebitandin û destdanîna li ser wan armanc e.

C) Hedefên Leşkerî:

– Pişteka mêtingehkariyê ya li Kurdistanê ku artêş e bi carek (yekcar) hedef e

– Hemû yekîneyên taybet ku dixwazin li Kurdistanê şerê taybetî berfireh bikin (artêşa taybet, tîmên taybet, kontrgerîla û cerdevan) hedef in

– Hemû yekîneyên ewletiya hundirîn ku cihazên birêvebirina dewletê (polîs, endamên MÎT'ê û parêziya sivîl) hedef in

– Hemû hêzên ku li dijî têkoşîna me hatine birêxistin wek ajan, hevkar û hêzên paşverûyên faşîst hedef in.

Biryarên din jî ev in:

– Avakirina Meclîsa Neteweyî ya ku karibe îradeya gelê me ya azad binûnerîne

– Avakirina Meclîsên Eyaletê û Hikûmetên Eyaletê

– Li Kurdistanê, li deverên ku gelê me bi giranî lê dijî damezirandina hemû cure saziyên siyasî, civakî û çandî

– Li Kurdistanê û li deverên ku gelê me bi giranî lê dijî bicihkirina sîstema me ya daraziyê

– Dest bi xebatkirina pêkanîn a artêşa siyasî ya cepheyê ku hindiktirîn hejmara xebatkarên wê digêhe 300 hezarî

– Bi hêzên Kurdistanî yên li derveyî me yên welatparêz, demokrat re avakirina cepheyeke dorfireh û demokrat û pê re jî xwe gihandina Kongreya Neteweyî

– Hindiktirîn bi destxistina artêşa gel ku ji 50 hezarî pêk were û ji wan bi kadrokirina 10 hezar

– Bi cihanîna lazimiyên dema nû, ji bo temînkirina koordineyê xebatên damezirandina qerargehên cengê û serleşkeriyê û navendîkirina wan

– Sazkirina artêşa milîsiyê û hewldana çêkirina komandariya wan

– Belavkirina têkoşînê li parçeyên din û li wan deran jî pêşvebirina kontrol û otorîteya partiyê.

– Li başûrê Kurdistanê (parçeyê bindestê Iraqê) tesfiyekirina hêzên dijmin ên li hemberî têkoşînê

– Bi mebesta belavkirina şer li Tirkiyeyê jî, damezirandina yekîneyên livbaziyê di bingehên ARGK'ê û ERNK'ê de

– Navendîkirina sazîbûna artêşê di radeyeke bilind de, di bingeha qerargehên Navendî de avakirina akademiyên leşkerî

– Ji bo ku jin bi awayekî aktîf beşdarî cengê bibin, avakirina artêşa jinan ku hîm hatibû danîn û çêkirina komandariteyên wê.

*Çîrokeke xerîb:*

# 'Ez tu me, ez ne ez im!'

Bêyî ku, herdu dergevan wî bigirin û jê bipirsin, "Tu kî yî?" jê re derî vedikin û dibêjin wî: "Derbas be, yê mezin li hêviya te ye, civînê nû dest pê kir." Û gava derî li dû tê girtin, xwe di saloneke ji yên padîşahên ku, di hin pirtûkên dîrokî de li ser wan xwendibû dibîne. Dirêjî û firehiya salonê li dor 300 metre çarçikî ye. Di sînga wê de rûniştekek -bi ava zêr hatî şûştî- danîne, lê bêyî kesî rûniştî li ser bibîne û ji wê rûniştekê û heya berî sekinîna wî bi çend metreyan du rêzên rûniştekan dirêjkirî ne. Kesên ku, li ser rûniştî, piraniya wan jê re biyan in, lê hin nasên xwe jî di nav wan de dibîne û yek silavan li wan dike. Ji K. Metê dikandarê di ber mala wî de -û dibîne hin şagirtên wî jî rûniştine- heya digihîje cem karkerê dibistana ku, lê mamostetiyê dike. Lê kesên nenas jî carina wêneyên wan dîtine an li ser cildê pirtûkan an jî di rojnameyan de.

Û berî ku, karibe xerîteya hundir xweşik bikişîne, dengekî zer ji ser rûniştekа di sîng de herikî û di nîvê salonê de kom bû. "Di qefesê bikeve." Bi wî dengî re çavên E.Toma li komek bilind û fireh ji "gû" -di nîvê salonê de venîştî- dikevin. Û dema ku, ber bi kesên rûniştî dinêre her kes radibe ser xwe ku, ew jî li ser komek "gû" rûniştî.

Careke din zikê xwe guvaşt, tiliyên wî mîna pênc xençeran hunara wî diçirînin. Hundirê wî dikele. Pêl li dû pêlê radibe. Dil hatî û di kêndira gewriyê de bûye "çiqina maran" dike ku, di dêv re derkeve. Ber bi kebînê dibeze û di deriyê wê de dinya li ber çavan reş dibe, mij û dûman dikeve erdê. Laşê wî ditevize, xwêdanek serjêkirî wî dipêçe û mîna darek kok kurmî tê xwar. Bi terqîniya ku, ji seriyê E.Toma tê, dema li keviya kevirê pêpelokê dikeve çend kêzik ji xewa nîvro radibin û meşînek leylanî ber bi wî tên. Bêhna verîşiya miroveki wan dikişîne:

– Tu çi dibêjî? Ev mirî û bi pirsa xwe re ket nav gola verîşiya wî.

– Wê rojekê bi kene, kêzika din lê vegerand û dema baskên xwe li hev xistin çend hêsir ji nav weşiyan.

– Me hînê karê xwe yî rojane bi.... û kaniya hêsirên ku, di bin baskên wê de derbûbû ziwa dibe.



– Ka were alîkariya min bike û em wî ji nav gola verîşiya wî derînin, kêzika yekemîn got.

– Kes nikare alîkariya yên din bike tu xwe dibînî.

– Ez te jî dibînim.

– Bes ez tu me, ez ne ez im û eger bawer nakî ka em ji vî termî bipirsin.

– Min bihêlin.... berdin... direvin/vim. Çima nalebitin... hi... girê bidin kê baskên min dizîne. Bi vekirina devê E.Toma re û domandina verîşiya wî re herdu kêzikan peyvên xwe ji nav ên wî dizîn. "Herin, giş bibezin, lê rojekê ezê we bigirim.. Binasim ka hûn çi kes in" Û her tim di cihê xwe de radibe/ datê lê ew gav di navêna wî û seg de nayê şikandin. Çi tiştên li dora wî û seg belav in, ber bi pêş ve diherikin. Mirov... çivîk.... dar.. mal û riya ku, ew û seg pê ve hatine girêdan ew jî ber bi pêş ve diherike.

Lêdana çakûçan di seriyê wî de bilind dibe û bi qelaştina serî re ku, dibe du perçe mîna zebeşekî. Ji nav nivînan hildibe. Heya bi çend lêdanan E.Toma nizane ew lêdanên çakûçên xewna wî ne, an lêdana kesekî ji deriyê wê re ye. Di golên xwêdanê de hatî şûştin û di bin balîva xwe de termê du kêzikên mirî dîtin, dema dest avêt wî cihî û xwest kilîtê derîne, lêdana derî her diçe germ dibe û vedigere dibe destekî ji dûmên. li qirika wî diale û ber bi derî dikişîne. Ji pişt derî ve bang li kesê aliyê din dike. Lê bê ku, ew kesê li derî dide deng bi xwe xîne, destek di derî de şîn dibe û di nav tiliyên xwe de namek girtî. Piştî ku E.Toma namê distîne, ew dest di hundirê textê derî de winda dibe û li şûna xwe birînek kevin. dev hatî girtin dihêle. E.Toma li ser çar lingan vedigere hundirê xênî û gava dikeve roniya xênî, çavên wî bi segekî raketî di nav nivîna wî de dikeve. Nerm û bi dizî xwe di kuncikê xênî de diçelmisîne lê seg çavan radike û ber bi wî dinire:

– Kî bû ew li derî dida, seg jê dipirse.

– Tu çi ji min dixwazî, çima ketî dû min, didî dû min.. min...?

– Pirsên te pir in. Ka bixwîne çi di hundirê wê nameyê de heye?

– Tu ji ku zanî?

– Mat nemîne ez tu me, eger tu çiqasî ji min baz bidî jî.

Û bêyî ku, E.Toma karibe xwe li ber pêlên xwestekên çavên seg bigire, destan diavêje beriya xwe û nama destê ku, di derî de şîn bûbû dertîne. Seg ji nav nivînan dertê li hember wî rûdine. Li çavên hevdu dinêrin, her yek xwe di çavên yê din de dibîne:

– Ka bixwîne çi dixwazin? Lê gava E.Toma dixwaze bixwîne, dinase ku, xwendin ji bîrkiriye û bêyî ku zanibe ji kengî ve seg destan ber pê ve dirêj dike û wê nameyê jê distîne. Û li ser ronahiyek di teniyê de hatî gevizandin dixwîne. "Ji zû ve em li pey te ne. Tu bi ku ve diçî/ tu, çi dikî/ tê bikî? Em her tiştî li ser te dizanin, li cem me nivîsandiye. Heya doh kar û livên te hebûn. Belê hin karên te hebûn, yê mezin jê ne razîbû, lê me çav li ser dadimrandin; lê doh bi wî karê te yê mezin pir zirt bû û te di civîna xwe de dixwaze."

*S. Memed*
*Ava mezin- 6453*

Bi xwendina navê xwediyê nameyê û cih- dîroka nivîsîna wî re, seg wî pelî ji nû ve ber bi E.Toma ve dirêj dike:

– Te çi jê nas kir û ka ji min re bibêje kî ne ev û çi ji min... û bêyî ku, bihêle zincîra pirsên xwe bibe serî. Seg jê pirsî:

– Çima te doh wilo kir?

– Min çi kir?

–Te çima gote şagirtên xwe "Çênabe.. belê nabe ku, pepûk di qefesa xwe de bin û her kes divê qefesa xwe bişkîne." Te ev gotin doh negot?

– Belê, bi stûxwarî E.Toma vegerand. "Bes divê çivîk ne di qefesan de bin."

– Ma ew karê te ye? Çima qefes çêbûn? Dema ku, her qefesek çêdibe divê pepûkek di hundir wê de şîn bibe.

– Ezman ji bo çi ye?

– Ew jî xefkeke ji pepûkên wek te re ye ku, vê pirsê bikin. De ka niha ji bîr bike ku, doh hebû, di navbera îro û pêr de çaleke reş î bêbinî di mejiyê xwe de bikole. Ji bo ku tu herî civîna yê mezin û ew te berat bike.

– Ezê çawa herim? Ne ava mezin nas dikim û ev dîroka 6453 ezê kengî û çiqasî herim heya ez bigihîjim wê.

– Ew ne karê te ye, niha tuyê rabî biçî mexferê û ewê te bigihînin yê mezin; lê berî tu diçî, te çi dît divê tu nebinî û bi gotina dawî re E.Toma wî li pêş xwe nabîne. Lê dengê wî ji deverekê diherike: "wilo be... Divê tu di civîna yê mezin de jî wilo bî." Wî çiqas li derdora xwe mêze kir ku, zanibe seg xwe di ku derê de veşart û dengê wî ji ku diherike, lê çavên wî bi tişt neketin.

Piştî ku seg winda dibe ew ber bi nivîna ku, di nivê hundir de mirî tê. Radihêje seriyê nivînê.. balîv ji ser herdu kêzikên çelmisî hiltîne, lê çav bi tu tişt nakevin; di ber xwe de dikene û gotinên seg tên bîra wî. Balîvê ji dest xwe diavêje û ji mal dertê. Di rê de rastî çend şagirtên xwe tê ku, her yekî ranehiştiye qefeseke dagirtî bi mirina pepûkek serjêkirî û gava cavên wan bi mamoste E.Toma dikevin, li qefesên di dest xwe de dinêrin û di rûyê wî yê bûdele de dikenî ...nî...nî...nîn.

**Pîr RUSTEM**

# Işq û azadî

Eger çî şew direng e saqî bom têke kemêkî tir
Kewa em şew serî helda le naxim da xemêkî tir

Li bade em jeme têr ke minî tînûy ciger sûtaw
Be çî diyar e ke deybînim şewêkî tir, jemêkî tir!

Ewende derdedar û bêperistar im ke pêm wa ye:
Le ser kêkî temen helnakirê taze şemêkî tir

Gelêkim rojigarî tal û şîrîn rabiward, axo
Merig mewda deda dîsan bibînim serdemêkî tir!

Geyşitme ser tiropkî arezû rojê, keçî riwanîm:
Le pêşim daye zerd û mah û sext û estemêkî tir

Heta çarşêw be ser towe debînim nazenînî Kurd
Be ser bîbîlekey çawî mina dekşê temêkî tir

Nema Xanî heta çîrokî îşqî ême darêjê
Dena hêşta le Kurdistan dejîn Zîn û Memêkî tir

Pepûley xoşewîstî min le şwênê nagirê aram
Denîşê û balî debzêwê le ser sîne û memêkî tir

Hezar hênde perêşan û siyaçare bijîm hêşta
Le nêw dil da heme awatî xal û perçemêkî tir

Hetakû dwa pişû rêbwarî rêgay îşq û azadîm
Eger bêcge le nakamîş nebînim berhemêkî tir

Ke firmêskim le ser rûxsarî kijî dil şikaw bînî,
Gûtim: Yaxwa le ser sûr gul nebînim şewnimêkî tir

Şewêkî çawenwarit bûm, nehatî giyanekem, wîstit
Minî dil naskî şaîr bigêrim matemêkî tir

Xidir nîm bo temen şêt bim be kaniy jînê da nûsêm
Ewendem jîn dewê ta dem denême nêw demêkî tir

Be to çarey çilon dekrê derûnî pir le nasor im
Xesarî bo dekey dûktorî zana merhemêkî tir

Behar û gul, kiç û mange şew, şîirî ter û bade
Lewey ziyatir cenabî Şêx gerekte alemêkî tir

**HÊMÎN/ 1977**



*Jan Dost*

## Xelata Xanî

Li Helebê Xelata Xanî hate dayîn. Di pêşbaziya çîrokan ya ku ji aliyê **Koma Xanî ya Çand û Wêje** ve hate li darxistin de xelata Xanî hate belavkirin. Di encama pêşbaziyê Xelata yekemîntiyê bi çîroka "Xewna Şewitî" **Jan Dost** stand, xelatên duyemîn û sêyemîn jî bi çîrokên **Çente** û **Pût, Ferhat Çelebi** û **Awazê Kalo** standin. Mihrîcana xelatdayînê roja 21.4.1994'an li Helebê çêbû.

## Ronakbîrên xwediyê Xelata Nobelê

Ronakbîrên ku xwediyê Xelata Nobelê ne, di serê meha Gulanê de wê bêne Kurdistanê. Li gorî Nûnerê Seroka Weqfa Azadiyan ya Fransayê **Daniella Mitterrand, Bernard Dorin** ku di 4'ê Avrêlê de li Enqerê diyar kir, wê 9 ronakbîrên xwediyê Xelata Nobelê ji bo aştiya gelên Tirk û Kurd bêne Kurdistanê. Nûnerê **Danielle Mitterrand, Dorin,** di civînê de daxuyand ku, 10 ronakbîrên xwediyê Xelata Nobelê, ji bo aştî li Tirkiyê bête hêvişandin (muhafezekirin) bangek amade kirine û di 29'ê Adarê de jî ev bang pêşkêşî Sekreterê Giştî yê Neteweyên Yekbûyî Butros Galî kirin. Ronakbîrên ku bi îmzeyên xwe beşdarî vê bangê bûne û wê di serê meha Gulanê de bêne Kurdistanê, ev in: Mauread Corrigan, Parêzgera Mafên Mirovan yê Başûrê Amerîka Rigoberta Menchu, Betty Williams, Dalai Lama (Ji Tîbetê), Bawermendê din yê Başûrê Afrîkayê Desmand Tutu, Oscar Arias Sanchez, Linus Pauling, Adolfo Peres Esguivel û nivîskarê Amerîkî yê bi nav û deng Elia Niesel.

# Xo wayîrê çêyî, yê bînan dizd zanayene

Serbeta ke mordem bişîkiyo tayê çiyan kilm û rind biyero ziwan, na vatena corêne zaf cayê xo de ra. Wayîre çêyî kam o? Dizd kam o? Keso ke çiyan ra dûrî yo, xebera xo çiyan ra çîna, ebi bîr û baweriyê de temîze xeletî û kemasiyan keno, zerarê xo çîno. Mordem şîkîno piyanê niyanênan de qese bikero. La belê keso ke wendo, vano ez zana wa, ez roşnabîrê Aleviyan a, ez çep a û verde jî çepitiye kerda, mordem nêşîkîno nînan de qese bikero. Zaf biyê bereda, zaf biyê cahîl, zaf biyê tersonek û ser de jî zaf biyê zalim. Hênî biyê zalim ke şîkînê bêkesan re îşkence jî bikerê. Namê nayê jî pareznayêna heqe, heqa Aleviya, demokrasî, laîsîstiye ûêb. na pira.

Hêya! Meydan tal mend, na taliye ra nînan menfat dî. La belê ew ro ra tepiya ganî mordem çimanê xo mecêro, ke tayê bêşit û bêpîrî leşa merdanê/şehîdanê Sêwazî ser ro polîtîka bikerê; payîna leşa mayanê, wayanê, piyan û apanê ma nê.

12.04.94'de Navenda Kulturê Aleviyanê Anadoluye "Anadolu Alevileri Kültür Merkezi" Berlin de tayê pancî virayştî. Bêguman nê mordemeka gor bîr û beweriya xo, ebi vatene de bîne, kesê ke ze dîne fikrînê silaynay û nê mordemekî jî Berlin de "bî wayîrê çêyî û yê bîn jî bî dizdî". Nê rojan tayê çiyê rindî, newî jî amê vatênê. La bele nê çiyê bi qedr û qimetî siya çepla pirodayena cahîlan de mendî. Naye re jî ez wazena naca taye çiyanê nerinda, nerayşta ser ro vinderê.

Mordemek biyo nêbiyo, tebera biyo. Edet û toranê Aleviya, bîr û baweriyanê Aleviyan, mordematiya Aleviyan ya nêzano yan jî xo vîr ra kerdê û ebi nayê nêmaneno ser û binê qesa de wayîrê nînan vejîno. Hama ne seke ma ci ra fam keme, la belê ebi heşê kemalîzm, ebi heyraniya Tikbiyene, ebi ruhêde kole.

Kam qan beno? Bêguman famkorî, bêfamî, mordemê xo nenasî û ser de jî dişmenê şarê ma, dişmenê şarê manê Alevî. Ma nê mordemeka kamê?

**Yew:** Nê ya laîsîstiye nêzanê, yan jî serbeta ke kemalîstî, dewlete nînan ra hes bikero, tecavuzê laîsîstiye kenê. Laîsîstiya nînan laîsîstiya U. Mumcu ya, dê ra yew game avê nê şona. Nê nêwazenê jî Mumcu re, yan jî laîsîstiya dêra avê şorê.Tersenê, kole wê. Serbeta ke kesîtiyê de xo ya azade çîna, serba milk û malê axay canê xo danê. La belê serba xo? Serba xo teyna koleê.

**Dide:** Nê famkor ê. Hetê ra vanê Aleviye Şîara ama, hetê ra dişmeniya Şîa kenê. Hetê ra serba wusenî, serba kerdenanê dê berbenê hetê ra jî lewê zalim de hemverê mazlumî de ca cênê.

**Hîre:** Nê qe yew ziwan nêzanê. Nê ziwanê ma û piyê xo, kal û bavê zanê û xo qesê kenê– xo vîr ra kerdo tayê jî şermayînê nêwazenê qesebikerê ne jî ziwanê Tirkî zanê: Nê hem bêfamê hem jî bêziwanê.

**Çar:** Nê humanîst niyê. Humanistiy nînan tersonekiya nînan a. Ca wo ke nê metersê benê şêr, dişmentiya şaranê şenika, dişmentiya dînanê şenika, dişmentiya mazlumanê ze xo kenê binge bîr û baweriya Alevitiye erzene bine lingane xo. Û ca wo ke ne biterse, serba ninan ne qedr û qîmetê ziwanê me û pî, kal û bavî, nê qedr û qîmetê şartiyê, edetan, toran, kulturan esto. "Mordem mordem o". "Firqe çîna". Tirk, Tat, Laz, Ereb, Wuriz, Hermanî qe ferqe çîna. La belê Kurmancî der heqo rind de nênê serê ziwanî nînan.

**Ponc:** Nînan sarê xo ebi Kurmanca, ebi şafîtênî werdo. Hanefitenî, yan jî mezhebêde bîn, yan jî mislimaniyê nêvînenê. Esto çîno Kurmanc o, şafî yo. Nayê niya keno ke weşê dewlete, (weşê zordarî teyî bêro.)

**Şeş:** Nê hên zanê, ke dem demê verî yo. Nê sukanê girsan ra warzenê ra, ênê dewanê ma, sukanê ma û vanê raya xo bidêrê mi ez bena mebûs, heqa şima pareznena. Dê bota şo cihîlo siya. Ti kamî xapnena. Kam na dewr de qasê to kor mendo yan jî biyo kor, ke ez jî ze to kor bimanê yan jî bebê kor.

**Hawt:** Nê dişmenê îlim yê Hurêndiya îlim de şanika kenê kom. Pê şarî de qese kenê.

**Heyşt:** Ne dişmene wuseni ye. Dotime Resmane wuseniye ke ninan dest de re, ne veyvan de roşene de niyadê. Wusên kerdo çi halî, Elî kerdo çi halî.

**New:** Meydano ke tal amo verdayene, giran giran êno guretenê. Nînan re ca çîno û nêmaneno. Nê ya cayê xo yê bi qedr û qimetî cênê, yan jî ca wo ke nê nika tede rê, ze virana sosyal demokratan; virana vergan yan jî virana yê bînin; uca vindenê.

**Des:** Nê nêşikînê ebi namê eşîra xo mordemanê xo, qese bikerê. Heqa nînanan niyanêne çîna.

**L. JANDÎL**

# 'Çîroka Huseynê Kurd' derket

**Weşanxaneya Rewşenê** Beşa Swêdê, di Adara 1994'an de bi navê Huseynê Kurd pirtûkek çap kir. Huseynê Kurd çîrokeke gelêrî ye. Çîroka Huseynê Kurd ji aliyê **S.İzzet Güven** ve hatiye kom û amade kirin. S. İzzet Güven bi mehan an jî bi demsalan serê xwe li ser varyantên çîrokê êşandiye. Ji gundan, ji dengê çîrokbêjan bi kasetan berhev kiriye. Heta flîmê wê yê bi Farisî jî bi dest xistiye û wêneyê flîmê di pirtûkê de bi kar aniye.

Wekî ku di navê çîrokê de jî diyar dibe, lehengê çîrokê Huseynê Kurd e, hem jî pehlewanekî Kurd e. Serpêhatiya Huseynê Kurd li rojhilatê Kurdistanê derbas dibe. Ew pişt re diçe heta İran û Hindistanê. Tu pehlewan nikare pişta Huseynê Kurd bide erdê

Çîroka Huseynê Kurd ji nav gel, ji der û dora Amedê hatiye berhev kirin. Zimanê çîrokê zimanê gel ê der dora Amedê ye, lê di çîrokê de gotinên Soranî ji derbas dibin. Pirtûk bi tîpên gir e û Huseynê Kurd ji 64 rûpelan pêk tê. Mirov dikare Pirtûka Huseynê Kurd ji vê navnîşana jêrîn dikare bê xwestin.

**Weşanên Rewşenê**
**Drakenbergsg. 63 NB**
**117 41 Stokholm/ Sweden**

# Çand û rexne

Di têkoşîna civakan de, cihê çandê ne biçûk e. Lê ne di pêşiya polîtîkayê de ye jî. Ger mirov çandê têxe pêşiya polîtîkayê, wê mirov ber bi şaşiyeke pir mezin ve bibe. Ev rastî bi giranî jî, ji bo gelên bindest hîn bêhtir eşkere ye. Tew ku mirov bibêje çand û polîtîka ji hev dû dûr in, yan jî, ji hev azad in, wê gavê întixara mezin dest pê dike.

Ger polîtîkaya mirov tune be, çand û hunera mirov jî, bêbingeh e, bêbingehî jî tunehî ye.

Bi vê baweriyê gava ku mirov li ku û avahiyên kes li ser çandê dixebitin dinêre, carina gotinên jî xwe mezintir dikin. Ev avahî û kes, hunerên wan çiqas mezin bin bila mezin bin, ji têkoşîna polîtîkî ne mezintir e! Ji ber ku hebûna wan bi xwe berhemeke polîtîkî ye.

Yek ji van avahiyan jî NÇM ye. NÇM ji roja ku ava bû ta îro, bi dîtineke neteweyî xebatên xwe meşand û dimeşîne. Lê carina dîtinên cuda jî derketine holê. Mirov dikare bibêje ku ev jî rengên neteweyî ne. Her gav, armanca NÇM'ê bûye xizmeta têkoşîna rizgariya neteweyî. NÇM'ê ev dîtin, di xebatên xwe de ji bo yekîtiyê ber bi xwe ve aniye. Tu carî ew dûrî xwe nekirine. Lê dîtinên kronîk, derveyî xizmeta gel û çandê, dîtinên aşiqî xwe(!) her gav mehkûm kiriye.

Di van rojên dawî de, di rojnameyan de weke ku NÇM di dîtineke burjûwazî de be tê xuyakirin. Sedemê vê jî, di çend hevpeyvînan de, endamên Koma Mezrabotan gotine ku em muzîka burjûwaziya biçûk çêdikin, dema muzîka ajîta û sloganan derbas bûye ye. Hevalên Koma Mezrabotan ew bi xwe dibêjin, "Em ne di wê dîtinê de ne. Ew çewtiyên redaksiyonê ne" wan gotibe ne gotibe, jixwe di rewşa îro de munaqeşeya ser mijarê bi xwe çewt e! Ji ber ku ji riya marksîzmê pê ve, tu rê ji me re nabe rê û me ber bi xelasiyê ve nabe. Ya din, di van hevpeyvînan de hatiye gotin ku ji NÇM'ê û Nizamettin Ariç pê ve tu kes muzîka Kurdî çênake!

NÇM di tu deman de nebûye xwediyê dîtineke wilo çewt û mezin. Berî NÇM'ê jî muzîka Kurdî hebû û bi du NÇM'ê jî, wê muzîka Kurdî hebe. Kî tiştê wilo bibêje, tê wateya ku muzîka Kurdî qet nas nake.

Di nivîsa heval H.Sefqan de jî, di vê wateyê de çend rexneyê wî hebûn. Rexneyên wî bi giranî di cih de ne. Em jî di wê têkoşîna dûrketina bandora çanda Tirkan de ne! Û em tu carî xebatên Hunerkomê bincil nakin. Tevî kêmasî û başiyên wan, Hunerkomê bingeheke mezin di vî warî de avêtiye. Em dîsa dibêjin, em avahiyeke neteweyî ne, em di dîtineke materyalîst de ne û em di xizmeta gelê xwe û hemû gelên bindest de ne.

**Î. XORT**

# Hişyariya ji xewa giran: Rojnameya 'Kurdistan'



Hîmdarê Rojnameqeriya Kurdî Mîthat Mîqdat Bedirxan

*Mirov dikare bibêje ku bi sirgûna vê malbatê re jiyana ronakbîriya Kurd û bingeha lîteretûra rojnamegeriyê hatiye avêtin. Gelê Kurd keys neditiye ku mafê xwe yên nivîsînê bi kar bîne. Lê roj hatiye ku rojnameyek bi destê welatparêzekî malbata Bedirxaniyan derçûye û ev rojname di dîroka Kurd û Kurdistanê de bûye destpêka qonaxeke nemir. Ji wê rojê pê ve hemû nirxên mirovahiyê, hemû meseleyên Kurd û Kurdistanê bi çand û medeniyeta xwe ve derbasî zarê nivîsê û rojnamegeriyê bûne. Ev sala pîroz1898 e. Di 22'yê Avrêlê (Nîsanê) de ronahî daye.*




Berga Rojnameya Kurdistan

Piştî bikaranîna çapxaneyê li Ewrûpayê, du sed sal bi şûn ve derbasî împaratoriya Osmaniyan jî dibe. Ji wê bi şûn ve jî ew gelên ku xwedî netewe û çandê bûn û di bin nîrê dewleta Osmaniyan de bûn jî ev çapxane û mesleke rojnamegeriyê pejirandin û mercên wê anîn pê. Di nav neteweyan de ya herî paşvemayî mixabin gelê Kurd bû. Rojnamegeriya Kurdan liqayî hin mercên pir hêsan û ji aliyekî ve jî pir dijwar tê.

## SEDEMÊN DESTPÊKA ROJNAMEGERIYA KURDÎ

Ji bo rojnamegeriya Kurd pêwist bû ku hin ramanên neteweyî çêbibin. Şoreşa Fransiz û mercên têkiliyên împaratoriya Osmaniyan jî, ji bo çêbûna destpêka rojnamegeriya Kurd bûne sedem. Di van salan de Ermenî cih bi cih serî hildidin û li hemberî Osmaniyan têdikoşin. Şerê Osmaniyan li hemberî Ermeniyan bi giştî li hin deverên Kurdistanê diqewime. Car caran Kurd jî bi nezanetî di vî şerî de cih digirin. Ji aliyekî din ve di nav sînorên Osmaniyan de Kurdistan û rewşa wê ya begîtî, mîrtiyê bi hin taybetiyên xwe ve wek pirsgirêkeke mezin bû ji bo Osmaniyan. Herwekî di sala 1821-1847' an de Bedirxanê Mîrê Cizîrê li gelek deverên Kurdistanê bû xwedî gilî û maf, ji wê pê ve Osmaniyan bi saya Yezdan Şêr ew bêtesîr kir û hemû malbata wî sirgûnî biyaniyê herwekî Stenbolê kir.

Mirov dikare bibêje ku bi sirgûna vê malbatê re jiyana ronakbîriya Kurd û bingeha lîteretûra rojnamegeriyê hatiye avêtin.

Gelê Kurd keys neditiye ku mafê xwe yên nivîsînê bi kar bîne. Lê roj hatiye ku rojnameyek bi destê welatparêzekî malbata Bedirxaniyan derçûye û ev rojname di dîroka Kurd û Kurdistanê de bûye destpêka qonaxeke nemir. Ji wê rojê pê ve hemû nirxên mirovahiyê, hemû meseleyên Kurd û Kurdistanê bi çand û medeniyeta xwe ve derbasî zarê nivîsê û rojnamegeriyê bûne. Ev sala pîroz1898 e. Di 22'yê Avrêlê (Nîsanê) de ronahî daye.

## ROJNAMEYA KURDÎ YA YEKEMÎN

Sultan Abdulhemîd di nav sînorê Kurdistanê û deverên dewleta Osmaniyan de ev kar qedexe kiribû. Her wekî Siltan û der û dorên wî, ji ramana pêşveçûna neteweya Kurd ditirsiyan, lewre rastiya Ermenî û Ermenîstanê li pêş çavan bû. Navê Kurdistanê jî, ji karbidestê Osmanî re tehl dihat. M. Emin Bozraslan der barê vê yekê de wiha dibêje: "Navê Kurdistan di resmiyetê de dihate qebûlkirin, navê gelê Kurd azad bû, dibistan (medrese) hindik bûn, lê li wir ders bi Kurdî bûn û bi Kurdî perwerdehî dihate kirin. Lê rojnameya Kurdistan dawa neteweyî dikir. Karbidestên Osmaniyan digotin: "Navê Kurdistan û zimanê wan bila hebe, lê pêwist e ku Kurdistan eyaletek ji Osmaniyan be. Destûra xwenaskirina neteweyî gere tunebe û qalkirin jixwe di vî alî de pêwist nabe."

## BERPIRSIYARÊN "KURDISTAN"

Rojnameya Kurdistan ji ber van mercan cara pêşîn li Misirê, li Qahireyê derçû, 5 hejmar wiha dewam kir. Her wekî ev rojname di wê dewrê de bi tîpên Erebî û bi Kurdî û Osmanî derkete pêşiya xwendevanan. Di vê rojnameyê de li ser gelek meseleyên çandî, dîrokî û civakî hatiye sekinîn. Der heqê çêbûn û amadekariya rojnameya "Kurdistan" de M. Emin Bozarslan van tespîtên hanê dike: "Wê demê rewşenbîrên Kurd zimanê Kurdî, bi tîpên Erebî dinivîsandin. Ji ber vê yekê rojnameya Kurdistan bi tîpên Erebî lê bi Kurdî ye. Rojnameya Kurdistan cara pêşîn li Misirê hatiye çapkirin. Ji her nusxeyekê 2000 heb bêpere şandine Kurdistanê û ev tişt di rojnameyê de hatiye nivîsin." Piştî hejmara 5'an rojnameya Kurdistan ji ber pêkutiyên Abdulhemit ketiye hin astengiyan û ev rewş bûye sedema cihguherîn û berpirsayar guherînê.

Mîqdat Bedirxan vedigere Stenbolê û Abdurahman Bedirxan dest bi weşana vê rojnameyê dike. Lê li Ewrûpayê. Ji hejmara 6'an pê ve Kurdistan li Cenevreyê derdiçe. Piştî hejmara 20'an rojnameyê cihê xwe guhertiye û çûye Londonê, li vir jî hejmarek derketiye û hin cihên din ên cur be cur jî guhertine, dû re di 14'ê Avrêla 1902'an de dawî lê hatiye û li ser hev 31 hejmar derketiye.

Rojnameya "Kurdistan" ne tenê di dîroka rojnamegeriya Kurdî de, lê di warê siyasî û çandî de jî cihekî xurt girtiye. Em di pirtûka Dr. Kemal Mazhar Ahmed de dibînin ku dema ev rojname li halê weşanê bûye, li Kurdistanê li ser Ermeniyan kotekiyeke mezin hebûye, ji ber vê sedemê Kurd ji aliyê Osmaniyan ve hatibûne xapandin û bi tevî Osmaniyan li gelê Ermenî haqaret dikirin. Vêca berpirsiyarê rojnameya "Kurdistan" ev rewş nepejirandiye û li hember Ermeniyan siyaseteke biratiyê li dar xistiye. Her wekî di vê demê de Kurd hê nû bi xwe dihesin û hê nû hestên neteweyî di nav wan de bi awayekî rêk û pêk derdikevin. Rojnameya "Kurdistan" di vî warî de gelek xabatên hêja kiriye. Li Ewrûpayê bi rêxistinên muhalîfên Osmaniyan re têkiliyeke xurt daniye. Mînak: Bi rojnameya "Osmanlı" re têkiliyên germ domandiye. Ji aliyekî din ve jî nivîseke Abdurrahman Bedirxan di rojnameyeke Ermeniyan de derçûye.

## ROLA ROJNAMEYA KURDISTAN

di pirtûka Dr. Kemal Mazhar Ahmed de wiha tê gotin: "Rêxistina Osmaniyan nifaq dixiste têkiliyên di navbera Kurd û Ermeniyan de, ji bo vê jî, ji destê wan çi hat kirin û dijmintiyeke mezin xistine nav wan herdu gelan. Di nav Kurd û Ermeniyan de yê ku vê talûkeyê dîtin hindik ronakbîrên Kurd û Ermenî bûn. Osmaniyan di sala 1880'an de qirkirina Ermeniyan xwestin bispêrin Şêx Ubeydullahê Nehrî, lê wî ev xwestin nepejirand. A. Bedirxan bi tîpên Erebî nivîsek di rojnameyeke nêzî Komeleya Taşnaxê "Troşnak" (Al) de weşand, ji vê jî sedem rê li ber hildana şerê di navbera Ermenî û Kurdan de bû. Çawa ku em dibînin ev rojname bûye sedema siyaseta Kurdan a li hember Ermeniyan û ji bo vê ye ku gelê Ermenî îro me sûcdar nake". M. Emin Bozarslan bi devê berpirsiyarê rojnameyê di nivîsîneke xwe ya ji bo salvegera rojnameya "Kurdistanê" de wiha dibêje: "Di nav tevahiya welatan de gel bi zimanê xwe dixwîne û dinivîsîne. Ji ber vê yekê jî ew gel bi pêş ve dikevin û digihîjin heqê xwe. Em Kurd ewqasî pir jêhatî ne, lê mixabin ku mecal û îmkanên xwendinê tune ne û gel (xelk) cahil û nexwendî dimîne û ji bûyerên der dora xwe û cîhanê serwext nabe".

Rojnameya Kurdistan çawa derketiye, bûye kevneşopek ji bo rojnamegeriya Kurdî. Ji vê rojnameyê bigirin ta niha bi sedan rojname derçûne û kevneşopa rojnameya "Kurdistan" hatiye qehîmkirin. Ji ber wê her sal, 22'ê Avrêlê ji bo me ne tenê salvegera rojnamegeriyê ye, lê wisa jî salvegera hişyarbûnê, rêxistiniyê ya neteweyî ye.

**M. Zahîr KAYAN**

# Gelo kî me?

Gelo kî me?
Mirov im ez
Gelo kî me?
Bi can im ez, bi çav im ez, ne bêhest im
Damar û ra û zenolî me
Gelo kî me?
Ziman im ez, dîrok im ez, xwedî xaz im
Dewlemend im, pir bi hêz im ne birçî me
Leheng im ez, dilêr im ez, ne rovî me.
Bi bav im ez, bi dê me ez, ne bêyî me.
Çima halo?
Ji ber çi ez ketime vî halî?!
Ne hempa me ji bo jînê!
Ne hêja me biramînim!
Bêhêz im, çavnebar im yan bêvîn ina!
Bi çavên xwe ez jî kor im, hîç nabînim!
Bi guhên xwe hema ker im, nabihîzim,
bêdeng im!
Bi devê xwe hema lal im, ziman nîn im!
Gelo mêjiyê min jî kurm e!
Gelo xwîna min bi werm e!
Ji bo çi ez bêtevgîr im, tev êsîr im.
Dijîna bê hîç mafê jînê.

Çima tirsî, çima şermî ji vê jînê?
Çima ez jî wek mirovan
Natêkoşim ji bo jînê?
Yanî îro ez tev eşîr im, hemî êl im, bêdîrok im!
Yanî îro ez rêbir im û sêwi me, bêserok im?!
Rast e pirsek herî seyr e!
Ji bo min jî hemî heyr e
Ma erê rast e çare nîn e?!
Çima ez dinêrim bi çavên din
Dibihîzim bi guhên dijmin.
Diaxivim bi zimanekî biyanî ye, ne xwaziya pir
bêar e
Rast e dara me bêraq e?!
Fêkî nade!
Siha xweyî hênik nadê!
Civata Kurdan çênakê!
Erê rast e?
Ez bi guman im.
Ne bawer im, pir bi hêvî me.
Xwe, muxtorî ji hozê rabê

Cilikên sor jî riswa bê
Rihên bost li cih de winda bê
Fars û Ereb divê bira bin ne axa bin.
Tirk û Faris ji hev cuda bin, mafperest bin.
Kurdistan hemî yek bar bêbirîn bê.
Ji derda û kulan xilas bê.
Çima ez dîlanekê nakim.
Xwe ji sînoran xilas nakim
Sibê ez rabim li Efrînû
Xwe taştê kim, li cem cihê Mem û Zînê.
Firavîna xwe amade kim li Amedê
Li Cizîrê û Nisêbînê Seyran bikim li zozanan,
li germiyanan,
Le Mehabad û Norşînê
Şîva bi tam herî ya xweş be
Li Midyad û li Zaxo û li Hemrînê
Hema Kurd im, tuxumhiz bim
Ji Kermanşan ta Bidlîsî
Ji Qamişlo tevî Wanê û Amedê
Li ser xaka Kurdistanê
Serî hildim ji bo jînê.

**Dr. Memo XARKOV**



# Serhildana ramanan

Ramanwer di dîroka afirandinê ya mirovahiya bi rûmet de xwediyê cihekî taybetî ne, ji ber ku yên astengî û çeperan ji ber xwe didin aliyekî, yên ku kevneşopên riziyayî diavêjin û rê vedikin ji bo hizr û tiştên nû ew in. Dîsa ew in yên ku bajarvaniyê çêdikin û mirovan dimeşînin li gorî zagonên dîrokî. Di vî warî de zana û hunersazên Yewnanî; Arîstoteles, Sokrates û Platon, her ne kêmî wan rojhilatvanên bi nav û deng; Konfîçyûs, Zerdeşt û hemû serokên şoreşên çînî, olî û neteweyî, stûnên zanistiya cîhanê wek Newton, Pascal, Descartes û Leonardo de Vinci û bi hezaran kesên din, ku jiyana xwe ji bo pêşvebirina zanistiyê û bicihkirina ramanên xwe yên zanistî di qada zanistiyê de canê xwe dane, cihekî pir bilind û payeberz digirin.

Rista (rol) ramanwer di nav civakê de wek ya bijîşkên di nav nexweşan de ye. Ji ber vî tiştî, jê tê xwestin ku cihê xwe binase û êş, derd û kulên civakê (mirovan) diyar bike, piştre jî çareyekê jê re bibîne. Civaka bêraman wek nexweşiya bêderman e ku roj bi roj nebaştir dibe û ber bi mirinê ve diçe. Di welatê me de ne bes e ku yek kes zana be û xwediyê ramanên cur be cur be. A mezintirîn ev e ku ew kes hemû hizr û ramanên xwe di warê bîrewer û ramandarkirina gelê xwe de bi kar bîne. Divê ramsaz tenê nebe ramanwerekî xwerû û dûvik. Divê ew bi rêçewanî bibe ramanwerê zanistiya rasteqîn, bêtirs xwe bidirikîne û li hemberî tu tiştê nezanistî bêdeng nemîne.

Di Kurdistanê de ramanwerî çawa ye? Kurdistan welatekî bêrûmet e, çima ku bindest e. Kurd neteweyekî nezan e, çima ku bêşivan e. Mirovên Kurd parçebûyî, şerpeze, pejmûrde ne ji ber ku xwediyê dijminên dirinde ne. Zanistî, bajarvanî qedexe ye ji ber ku dijmin jê ditirsin. Ev tiştên bingehîn û sereke ji wan hatine dizîn û tiştên pîs ji wan hatine çêkirin, mînak: Bêkarhiştina gel li welatê me siyaseta dewletê ye. Ew nahêlê li Kurdistanê gelek mirov bi kar û bar bibin, ev tişt jî di mirovan de tiraliyê diafirîne, mirovan bêrist û erzan dike.

Beşek ji wan mirovên bêkar xwe radestî vê pêvajoyê dikin, ji jiyanê dûr dikevin wek pelgê bi ber bayê ketî, ba ji ku tê bi ber dikevin. Ew kes dikevin nav karên lewitî û xwe ji rûmetê jî şûştine. Beşa din dixwaze pariyê nanê xwe bi hêsanî wergire. Ew dibe zilam û nokerê dewletê, amade ye her tiştî bide, çima ku jiyan û çarenûsa wî bi wê ve hatiye girêdan. Di bingeha xwe de dizî ji xizaniyê tê û ew jî siyaseta dewletê ye. Bi vê yekê jî dixwaze gelê Kurd ji netewebûnê bêxe û welatparêziyê qels bike.

Ev meseleyeke herî biçûk e, lê dîsa jî pir girîng e ji ber ku em bi xwe dijîn. Bêhtirên mirovên me vê rastiyê li xwe mixur nayên, ji hemûyan xerabtir jî zanayên me vî tiştî qebûl nakin û xwe bi erzanî difiroşin.

Divê em baş zanibin ku dayîka problem û êşên me bêwelatiya me ye, ji ber ku zanistî di bin kumê dewletê de xurt dibe, bi rêk û pêk tê meşandin û zanyar pir dibin. Bi van jî jiyan bi rûmet û şîrîn dibe, feqîr kêm dibin, nezan namînin, hezkirin çêdibe û kar dibe sembola rûmeta mirov. Di civakeke wisa de cihê mirovan li cîhanê mezin dibe, mirovên vê civakê li hemberî çavên kesên biyanî berz dibin.

Li welatekî wek Kurdistanê ramanwer berî ku xwe biparêzin divê welatê xwe biparêzin, hunermend divê hunerên welatparêziyê çêbikin û nivîskar divê kedkarê dewletavakirinê bin. Hemû hunermend, zanyar divê propagandaya welatê xwe bikin. Ji ber ku di welat de pêşketin, şaristanî, dewlemendî û rûmetî tê afirandin.

Der barê vî tiştî de em bavê welatparêziya Kurd gorbihuşt Ehmedê Xanî bînin bîra xwe, ew dibêje:


**“Ger dê hebûya me îttîfaqek
Wisa bikira me inqiyadek
Rom û Ereb û Ecem bi temamî
Hemiyan ji me re dikir xulamî
Tekmîl dikir me dîn û dewlet,
Tehsîl dikin me ilm û hîkmet.**

**Dr. Memo XARKOV**
***Ukrayna***

*Ji rewşenbîrên Kurd re:*

# Em pismamên hev in lo!

*Roj, roja hesabên sivik û biçûk nîn e. Xwe bi paş ve medin. Eyb e, fedî ye: vir de wê de qelpiyê nekin û çivan nedin xwe. Heke hûn birayên Kurd in û dilê we ji bo Kurdan diavêje werin. Hinek dereng be jî tiştek nabe, mirov ji ku derê zirarê bizivire kar e.*



Cîhan jî dibîne û hûn jî dibînin; em Kurd niha di demek gelek nazik û narîn de ne. Ewê ku hema piçek hesyet û bîr pê re hebe û piçek xwe berpirsiyar bibîne, divê îro rabe ser lingên xwe û piştgiriya vî şerê laleşî bike. Apo yê me, çek û sîleh dane destê keç û xortên Kurd, rext û rişme li pişta wan girê dane û rakirine serê çiya. Eferîm û sed car eferîm. Çiya xweş kiriye. Hezar sal in me destên xwe xistibûn bin çengên xwe, qey ne bes e? Ez bi xwe dibêjim: Apo helal be ji te û bavê te re. Bereketa Xewdê li we û PKK'ê be. Herî camêrtirînên Kurdan partîzan in, sermiyanê me û wan jî hûn in Apo.

Rewşenbîrê ku hema piçekî xwîna şehîdên Kurdan birame û li ser raweste, seh bike xwîna şehîd û lehengên Kurd çi ye, çiqas bi rûmet û biha ye, wê li xwe werqile, destê xwe bide eniya xwe û wê di şûna du destan de, bi çar destan şerê partîzanên Kurd destek bike û li çepikan bide.

Ewê ku îro bibêje: "Ez rewşenbîrê Kurd im. Min gelek pirtûk û mishef xwendine, haya min ji cîhanê û xelkên cîhanê heye, ez tekoşerekî aştiyê me û ez li hember zilm û tada mêtîngera me", bêyî rawestandinê divê xwe kar û bar bike û li kêleka rewşenbîrên Kurd cihê xwe bigire, mil bide milê pismam û mixaletiyên xwe. Lê bila kerem bike were, heta bi tevî bolperçe û qerewata xwe bila were. Cihê wan li ser seran û ser çavan heye û welat jî fireh e.

Çi bû ew bedl û qatlixên rîsîn me li xwe dikirin, me qerewat girê didan û me li unîversîteyan ders û tehlîm didîtin? Me komkomik çêkiribûn û me vir de wê de fors difirotin. Me digot: "Em Kurdî ne..."

Em dibêjin îro, roj li me ziviriye û hatiye danan, roja fors firotinê nîn e, xwîn wek Çemê Mûradê diherike û li her cihî û warî şer û ceng pêwist e. Divê em bi destên hev bigirin û herin ji xelkên cîhanê re bibêjin, ji bona çi keç û xortên me, rabûne serê çiya? Nexwende û gundiyên Kurd jî, mele û heciyên Kurd jî û dayikên Kurd jî ev seh kirine û ew jî ji bo partîzanan xwe feda dikin. Roj, roja hesabên sivik û biçûk nîn e. Xwe paşve medin. Eyb e, fedî ye; vir de wê de qelpiyê nekin û çivan nedin xwe. Heke hûn birayên Kurd in û dilê we ji bo Kurdan diavêje werin. Hinek dereng be jî tiştek nabe, mirov ji ku derê zirarê bizivire kar e. Werin li kêleka pismamên xwe cihê xwe bistînin û bila xelkê Kurd, lingek zû we bibexşîne. Nexwe wê navê we "nebaş" derkeve. Em ji we re niha dibêjin, paşê nebêjin: "We ji me re negot."Li vî alî û wî alî, li cih û deveran, ranebin li ser navê Kurdan fort û beredan nedin xwe û fors nefiroşin. Quretiya hûn li cihan dikin, em pê dihesin. Mafê we tune ye; viya jî zanibin...

Rojev li me qirase bûye û giraniya ser milên me têrî xwe heye, heke bera jî em pismamên hev in werin. Heke hûn nikaribin alîkariya barê ser milên me bikin, tiştekî hilgirin jî, nerevin û werin. Heke çek ji we nayê jî, qet nebe ranewestin, derkevin serê xaniyan, nava şibak û pacan û temaşa partîzanên xwe û Roma Teres bikin û ji partîzanên xwe re li çepikan bidin û bibêjin: "Hûn berxwedar bin." Ma ev jî ji we nayê malavano? Hema hûn direvin. Ji devê eywanan, ji ser şaneşînan jî hûn direvin hundir û hûn xwe vedişêrin. Eyb e.

Hinek Kurdên me hene, hingî xwendine, çavên wan nabînin û berçavk dane ber çavên xwe. Lê bi wan berçavkan jî rastiyê nabînin û hema ji xelkê xwe baz didin û direvin. Çima, çi bûye? Kî li pey wan e, kî zorê dide wan? Tu nizanî. Tiştê ku tu dizanî, hema ji civata xwe direvin û heya karibin xwe vedişêrin. Baz bide ku tu baz nadî.. Eyb e, şerm e, fedî ye. Nereve û xwe veneşêre. Xwe riswa meke. Di vê roja teng de tu neyê wê sibehê navê te "nebaş" derkeve. Were û wek zilaman li kêleka xelkê xwe cihê xwe bigire. Kurd dibêjin: "Mêr dimire nav dimîne, ga dimire çerm dimîne." Fermo, hûn jî werin û navekî qenc li pey xwe bihêlin.

Lê ji Xwedê eyan e, dengê çekên partîzanên lêlê û loloyan naçe rewşenbîrên me û xwe ker û lal kirine û deng ji wan dernayê. Piçek fedî nakin û nabêjin: "Wa ye keçên me yên çardeh salî, ew keziyên xwe yên dirêj li hev lefandine û bi şopa neyar ketine. Li ku derê neyar bibînin, nabexşînin û bi textikê eniya neyar ve datînin. Bûne agir û pêt û bi serê çol û çiyan ketine. Hinek li Agirî ne, hinek li Minzûr in û hinekan jî devê deriyê paytexta me kirine lîs û hêlîn.

We hemûya strana "Muso Mere" bihîstiye. Muso Sitya Memo direvîne, lê bi pey wan dikevin û Sitya Xanim birîndar dibe. Lê Muso yê te direve. Sitya Memo peyde bang dike û dibêje:

"Muso were, Muso were; malwêrano ka carek li pey xwe bizivire, ji nava milê Sitya Memo, mîna çem û kanî xwîn jê dere."

Lê li ser vê bangîna Sitya Memo, Muso vedigere. Em jî li benda rewşenbîrên Kurd in. Wek Muso hûn jî vegerin, em pismamên hev in. lo.

**Xurşîd MÎRZENGÎ**

## XAÇEPIRS

**Amadekar: Rasto Zîlanî**

**Çeperast:** 1–Serokê Konseya Leşkerî yê ARGK'ê 2–Hew/ Li Tirkiyeyê ajanseke nûçeyan 3–Kavil, kambax/ Navê giyayekî ku di meha Adarê de şîn dibe 4–Sîsbûna çîçek û şînahiyê 5–Li Rojhilata Navîn dewleteke Ereb/ Sembola Nîkelê/ Di Latînî de navê şeytan (berepaş) 6–Li ser, bilind/ Kişandina lêkera zayîn, di dema borî de, ji bo kesê sêyemîn a yekehejmar 8–Teqandin 9–Mîras 10–Navekî mêran/ Ronahiya rojê.

**Serejêr:** 1–Meqes/ Qesela hêrandî 2–Cetvel 3–Egît/ Navekî mêran 4–Ji rêzê, ketûber, ramakî (berepaş)/ Sewîl, avdank 5–Ricimkirin/ Kinnivîsîna partiyek Tirk 6–Kişandina lêkera bûn di dema niha de ji bo cînavka sêyemîn/ Dijwateya katot 7–Tahlîl/ Yezdanek ji Misra Qedîm 8–Sembola pereyê Alman/ Arvan 9–Xeyidandî 10–Navgîneke ku ji bo rûniştinê hatiye çêkirin 11–Fêkiyek 12–Bi Soranî kek.



**BERSIVA XAÇEPIRSA HEFTIYA ÇÛYÎ**

**Çeperast:** 1–Eladîn Sûcadî 2–Nîşan/ Afrîn 3–DS/ ÎGD/ Dan 4–Atom/ Îd/ Fa 5–Mor/ Eyalet 6–KGB/ Arî 7–Berik 8–Alûc/ În 9–Lîs/ Ga 10–Erase/ Îr

**Serejêr:** 1–Endam/ Pale 2–Lîstok/ Lîr 3–Aş/ Org/ ÛSA 4–Daîm/ BBC 5–Îng/ Re 6–Diyarî 7–Sa/ Daringî 8–Ûfo/ Lîk/ Ar 9–Cr/ Fe 10–Aîdat 11–DNA 12–Nav


## KARTA ABONETIYÊ

Ji kerema xwe re ji hejmara ...... pê ve min bikin aboneyê rojnameya Welat

Nav:

Paşnav:

Navnîşan:

**Bedelê abonetiyê razînin:**

**Li derve:** Mazhar Günbat
İş Bankası Cağaloğlu Şub. Şube No: 1095
Döviz tevdiat Hesap No: 3138437

**Li Tirkiyê:** Mazhar Günbat
İş Bankası Cağaloğlu Şub. Şube No: 1095
Hesap No: 0408342

Ji kerema xwe re cihên li jor vala dagirin û tevî kopiyeke pelê razandina bedelê abonetiyê bişînin.

**Navnîşana Welat:** Nuruosmaniye Cad. Atay Apt. No:5 Daire No:14 Cağaloğlu / İstanbul
Tel (Fax) 511 50 07

**Mercên abonetiyê:**

| | Li hundir | Li derve |
|---|---|---|
| 3 meh | 175.000 | 30 DM |
| 6 meh | 350.000 | 60 DM |
| 12 meh | 700.000 | 120 DM |



Navê min: Rêşan

# Hin pirsên zarokên me

– Bavê min ew çi ye tu dixwînî?

– Kurê min! Ev destana Mem û Zîn e, ez dixwînim.

– Bavê min! Çima nivîsandina pirtûka min ne weke nivîsandina pirtûka te ye?

– Kurê min pirtûka te ya dibistanê ye. Li welatê me jî dibistanên Kurdî nîn in.

– Lewre pirtûka me bi Kurdî nîn in?

– Kurê min welatê me Kurdan, di bin destên Tirk, Faris û Ereban de ye. Ev miletên han, welatê me kirine bindest û dewlemendiya wê dibin ji xwe re. Ji ber van hoyan, nahêlin em dibistanan bi zimanê xwe yê Kurdî vekin û bi zimanê xwe yê xweş bixwînin. Ji bo ku ew bibin xwediyê welatê me yê şîrîn, dixwazin em zimanê xwe ji bîr bikin û hînê zimanê wan bibin.

– Bavê min lê tu çawan hînê xwendina zimanê me bûyî?

– Kurê min! Min ji xwe re alfabeyek Kurdî ya ku bi destê nivîskar Osman Sebri ve hatiye nivîsandin, min anî û li ser wê xebitîm. Bi wî awayî ez hînê tîpên Kurdî û xwendina Kurdî bûm.

– Bavê min! Ez dê çawa bikaribim hînê xwendina Kurdî bibim?

– Tuyê jî weke min li ser alfabeyeke Kurdî bixebitî û hînê tîp û xwendina Kurdî bibî. Ji bo ku bikaribî sûd (istifade) werbigrît, tu dikarî alfabeya Mamoste Osman Sebri yan jî mamoste Siyamend İbrahim ya ku vê dawiyê çap kiribû bixwînî.

- Bavo ew çi denge?

- Kurê min! Ew dengê dîk e.

- Dîk bangîdide?

- Kurê min! Dîk bangî da, mizgîna sibehê ye.

- Bavo! Eger dîk bangî nede sibehê venayê?

- Na: Kurê min! Eger dîk bangî bide û bangî nede sibehê vetê, lê dîk mizgîna sibehê did. Ji ber ku cotkar û rêncber hişyar bibin herin karê xwe.

**M. Hemo EFRÎN**

# *Şîrê dayîkan*

Şîrê dayîkan ji bo zarokan
Dibe goşt û hestî
Ji wî goştî û hestî
Mirovên mezin çêdibin

Şîrê dayîkan spî û çîl e
Ji şekir jî şîrîntir e
Ji hemû şîran xweştir e
Ew şîr, pirr bi qîmet e

Min pirr mêtiye dem bi dem
Zikê min têr dibû û radizam
Ez nikarim înkar bikim
Ez bi wî şîrî mezin bûm

Têkoşîn jî ha ye
Şîrê dayîka dibe xwîn
Xwîn û hestî dibin yek
Û dibe jiyan.

Bihostek xwelî roj bi roj
Bi têkoşînê wê bibe Kurdistan.

**Xeyrullah KUŞMAN**
**(Dibistana seretayî)**

*Çîrok bo mindalan*

# Baxçey sawayan

Em sal serma û soleyekî zor yexey şarî girtuwe. Mindale nazdarekanî baxçey sawayan ta degeyştine baxçekeyan serma zor mandûy dekirdin.

Rojêkiyan mamostakaniyan hatine ser ew rayey ke her qûtabî û mangî dû dînarêk bidat, otomobîliyan bo bigrin baş tire û le dest em sermaye rizgariyan de bêt.

(Duway ewey be hendêk le mindalekaniyan wit, ke niyazî şitêkî awhayan heye bo ewey le dest ew serma zore rizgariyan bi bêt.)


Hendê le qûtabiyekan nebêt, ewanî tir ew pareyeyan nebû.. Bîriyan kirdewe ke beman çî ba her otomobîl bigrin. (Eman her sermayan de bêt.)

Ke mamostakan le encam da hatin ray hemuwan werbigrin le pêş da Taban witî:

– Eger otomobîl degrin ba bo hemûman bêt.. Eger na namanewêt. Hawrêkanî Taban hemûyan em qiseyey Taban yan pesend kird.

Ke mamostakan ray qûtabiyekanyan be berêweberî baxçe wit, le encamî em helwêste da berêweber kewte bîr kirdinewe lewe ke de bê karê bikrê hemû qûtabiyekan le serma bi parêzrên.

**Sîrwan REŞÎD**



# Koma Çiya: 'Cehşên çanda Kurdî jî hene'



***Stranên Kurdî îro wergerandine zimanên din, wek; Tirkî, Erebî, Farîsî û hwd. Wergerandina stranan tiştekî baş e. Lê mixabin ên ku stranên me yên gelêrî, li gorî dilê xwe wergerandine, qet girîngî nedane naveroka wan. Tiştê xerab jî ev e ku yên wisa kirine dîsa Kurd in.***

***Hûn dikarin Koma Çiya bidine naskirin, mebesta damezirandina wê çi bû?***

– Koma me di sala 1991'an de ji aliyê 7 hevalan ve hate damezirandin. Piraniya beste û helbestên ku ji aliyê koma me ve tê gotin, ên me ne. Armanca koma me, hem çêkirina muzîka xwerû û hem jî, muzîka otantîkî ya Kurdan e ku bi şîroveyeke hemdemî pêşkêşî gel bike. Di koma me de, keda pir hevalan weke Besê, Zana Farqînî, Melek, Hüseyin û Ali heye. Koma me, komeke ku her tim xwe nû dike ye. Pêşî hew me bi sazekê dest pê kir. Îro em saz, gîtar, cura, def û ûdê jî bi kar tînin.

***Ji bo têkoşîna Kurdan a îro bi dîtina we, muzîka Kurdî di çi rewşê de ye, pêwist e çawan be?***

– Rewşa îro ya siyasî ku gelê Kurd tê de ye, roj bi roj tiştên nû dertîne holê. Bi pêşvebirina têkoşînê ve mewziyên nû tên afirandin.

Îro gelê me li ber sê notayan radibe direqise, dilê wî wek volqan e, tu çi muzîkê çêbikî wê li berê govendê bigire. Lê ev wisa nabe. Gerek e em vê muzîka sê nota karibin bikin pênc nota. Ger em wisa bikin emê karibin feydeyekê li muzîka Kurdî bikin.

***Wek tê zanîn îro çanda Kurdî bi taybetî jî muzîka Kurdî tê talankirin. Çi bi destê Kurdan û çi bi destê Tirkan. Bi dîtina we, çawa rê wê li ber vê bê girtin?***

– Mirov dikare bibêje rêlibergirtina talanbûna çanda Kurdî girêdayî şoreşê ye. Wexta ku welatê mirov serbixwe be, kes nikare çanda mirov talan bike. Me hunermendên Navenda Çanda Mezopotamyayê bangî temamê hunermendên Kurd kir ku bên senetê xwe li Navenda Çandê bi awayekî rêxistinî çêbikin û bi hev re rê li ber vê talankirinê bigirin. Bi vê banga me gelek hunermend hatin û bi hevalan re hevdîtin çêkirin. Hinek ji wan man, lê hinek ji wan bi şertên me qayil nebûn û çûn.

Li gori dîtina me, tenê bi awayekî rêxistinî mirov kare li dijî vê talankirinê bisekine. Yanî mirov îro nikare bi serê xwe ji binê vî barê giran derkeve.

Stranên Kurdî îro wergerandine zimanên din, wek; Tirkî, Erebî, Farîsî û hwd. Wergerandina stranan tiştekî baş e. Lê mixabin ên ku stranên me yên gelêrî, li gorî dilê xwe wergerandine, qet girîngî nedane naveroka wan. Tiştê xerab jî ev e ku yên wisa kirine dîsa Kurd in.

Me berê di rojnameyekê de ji bo wan gotibû ku ew cahşên çandê ne. Wek ku cehşên gundan hene, cehşên çandê jî hene. Wek mînak em bibêjin hêj di dema Atatürk de Celal Güzelses ku bi eslê xwe ji Amedê ye, stranên gelêrî yên Kurdî wergerandine zimanê Tirkî. Komara Tirk navê "Şarkın Bülbülü" (Bilbilê şerqê) lê kir. Dîsa di wê demê de Mihemed Arifê Cizîrî eynî stran bi zimanê Kurdî digotin, lê dewletê qet rûmet nedayê. Ji ber ku bi Kurdî digot. Halbûkî hem bi deng û hem jî bi şêwaza gotinê, Cizîrî gelek gelek ji Güzelses çêtir bû.

Daxwaza me ji kom û hunermendan ev e ku li ku derê stran gotin, bila bibêjin ku ev stran li filan herêmê hatiye çêkirin, ji aliyê filan kesî ve hatiye wergerandin. Ji bo ku yên bi çanda me leyîstine bên deşifre kirin.

***Stranên ku hûn dibêjin, helbestên wan kî amade dike–çêdike?***

– Helbestên me giş ji aliyê koma me ve tê çêkirin, yên gelêrî jî dîsa koma me hêl bi hêl li herêmên Kurdistanê digerin û starên ku ji aliyê gel ve hatine çêkirin, lê ku bi giştî nayên zanîn li her deverê dibijêrin û di bernameyên xwe de pêşkêş dikin, ên din jî di arşîva xwe de em kom dikin. Hevalên ku di kaseta me ya yekemîn û duyemîn de jî niha ku li ber temam kirinê ye, helbest çêkirine dibe ku niha ne di nav me de bin lê helbestên me giş ji aliyê koma me ve hatine çêkirin.

***Li gorî dîtina we muzîka Kurdî kîjan e?***

– Muzîka Kurdî jî wek ziman e. Wek ku tê zanîn, zimanê Kurdî dikeve nav beşa Hînd–Ewrûpayî. Niha gelek meqam di muzîka Kurdî de hene. Lê mamoste Îqbal Hacibî bi cîhanê daye qebûl kirin ku çend meqam hene tenê li muzîka Kurdî tên. Li gor me jî, ya rast ew e.

***Behsa muzîka Kurdî ya modern an jî hemdem tê kirin, li vê yekê hûn çawa dinihêrin?***

– Li gorî baweriya me bi enstûrmanan mirov nabe hemdem. Ango kî kemanê, orkê, gîtarê û hwd. bide destê xwe û stranên me li gorî wan enstûrmanan çêbike, nabe hemdem. Hemdemî ew e ku, pêşveçûna gel bi hunera xwe bîne ziman. Enstruman hinekî muzîkê dewlemendtir dike. Wek mînak em bibêjin Rodrîgo (hunermendê Îspanyolî) ji bo gelê xwe hemdem e. Yanî ewî pêşveçûna gelê xwe bi gîtara xwe aniye zimên û bi cîhanê daye qebûl kirin.

Wek ku Mao (serokê şoreşa Çînê) jî dibêje çiqas teknîkên li Ewrûpayê hene emê feyde ji wan bigrin, lê emê wan li gorî çanda xwe bikar bînin. Ne ku em çanda xwe li gorî wan xera bikin. Em li hemberî tu enstûrmanî nîn in. Bes ku li muzîka me werin.

***Enstrumanên ku hûn bikartînin, giş ji aliyê komê ve tên jenandin?***

– Niha di şev û şahiyan de hevalên ku li enstrumanan dixin tev ji komê ne. Lê wextê ku me kaseta xwe ya yekemîn derxist, ji bo her enstrumanekî, me yek ji derve anîbû. Ji bo kaseta xwe ya duyemîn çi enstrumanên ku em zanibin bi kar bînin, em ji derve naynin. Lewre, însanên ku ji derve tên, û li enstrumanan dixin tenê ji bo pereyan dikin. Her wisa jî, tama ku mirov dixwaze, jê nastîne. Niyeta me ew e ku, enstrumanên em li studyoyê jî bi kar tînin di pêş de tev bi destê xwe lê bixin.

***Berî çendekê di rojnameya Özgür Gündemê de, di hevpeyvînekê de, hunermendên NÇM'ê gotibûn ku kes ji NÇM'ê û Nizamettin Ariç pê ve muzîka Kurdî çênake. Di rojnameye me de jî H. Sefkan bersivek dabû NÇM'ê. Li ser vê yekê hûn dikarin tiştekî bibêjin?***

– Bi rastî jî, li ser vê mijarê pir minaqeşe çêbûn. Çi çewt, çi rast. Em ji xwe re dibêjin NÇM hem avahiyeke demokratîk û hem jî avahiyeke neteweyî ye. Ji ber vê yekê dîtinên renga reng carinan derdikevin. Lê dîtina Navendê ne ev e. Berî NÇM'ê jî muzîka Kurdî hebû û wê piştî NÇM'ê jî hebe. Tu kesê ku aqilê wî li serê wî be vê îdiaya ji xwe mezintir nikare bike. Em bawer dikin ku tu hevalî wisa negotiye, kêmasiya rêzkirina nivîsaran e. Dîtina NÇM'ê, di her warê çandê de weke hev e. NÇM, bi çavê rûpelekî têkoşînê li çandê dinêre. Ev rûpel, rûpelê serkeftina kedê ye. N[illegible] serkeftina burjûwaziyên biçû[illegible] û ne jî feodalan e. Weke têkoşîna NÇM'ê ya li dijî van kesan, ya koma me jî, bi vî rengê xizmeta serkeftina kedê ye. Armanca me kesên li derveyî vê xetê, tevlîkirina vê xetê ye!

**Sîrwan REŞÎD**
**Salih GÜNBAT**

welat

- Li ser navê İMC Basın-Yayın Ltd. Şti. (adına) Xwedî (Sahibi) Zübeyir Aydar
- Berpirsiyarê Nivîsaran (Yazı İşleri Müdürü) Mazhar Günbat
- Navnîşan (Adres) Nuruosmaniye Cad. Atay Apt. No:5 Daire No:14 Cağaloğlu / İstanbul • Tel (fax) 511 50 07
- Nûnerên Rojhilata Navîn (Ortadoğu Temsilcileri) Fener Rojbiyanî – Jan Dost
- Nûneriya Ewrûpa (Avrupa Temsilciliği) Amed Tîgrîs
- Navnîşan (Adres) Drakenbergsg. 63, NB. 117 41 Stockholm / Sweden • Tel (0046) 884 01 25 • Fax (0046) 884 96 35
- Çapkirin (Baskı) Yeni Asya Matbaacılık